

2022

LI MALA XWE DI EWLEHYÊ DE ME DESTEPIRTÛKA PERWERDEHIYA ERDHEJIYÊ



EVİMDE GÜVENDEYİM DEPREM EĞİTİM EL KİTABI



Avrupa
Birliği **sivil
düşün**

EVİMDE GÜVENDEYİM LI MALA XWE DI EWLEHIYÊ DE ME أنا بأمان في المنزل

YAPIMCI
ÇÊKER
المنتج
DOLICHE FİLM

YÖNETMEN ve KURGU
DERHÊNER û PEVXİSTİN
المخرج و المحرر
SEVİM ERDEM
EYYÜP EPEKİNCİ

RENK-SES DÜZENLEME
ŞAZKIRINA RENG û DENG
محرر الصوت - الصور
DOLICHE FİLM

KÜRTÇE ÇEVİRİ
WERGERÊ KURDÎ
مترجم اللغة الكردية
BİLAL YILDIZ

BROŞÜR TASARIM
SÊWİRA BELAVOKÊ
مصمم الكتيبات
SÜMEYYE AÇIK

AFET VE ACİL DURUM YÖNETİMİ UZMANI
PİSPORÊ ALÎKARIYA LEZGÎN û BOBELATAN
خبراء الإغاثة
SABRÎ ERTAN KOCAELLI

ARAPÇA ÇEVİRİ
WERGERA EREBÎ
مترجم اللغة العربية
ŞİRİN KARABACAK

MÜZİK
MUZİK
الموسيقا
PIXABAY.COM

PROJE DANIŞMANI
ŞÊWİRMENDÊ PROJEYÊ
مستشار المشروع
İLYAS ERDEM

KÜRTÇE ANLATAN
VEBÊJERÊ KURDÎ
المتحدث باللغة الكردية
BİLAL YILDIZ

GÖRSEL STOK
STOKA DÎTBARÎYÊ
التصوير الفوتوغرافي
FREEPIK.COM
AFAD
İSTANBUL BÜYÜKŞEHİR BELEDİYESİ

ÇİZER
XÊZKAR
الفنان
EGEMEN İLİCİ
ERKAN KUŞKU

ARAPÇA ANLATAN
VEBÊJERA EREBÎ
المتحدث باللغة العربية
ŞEHRAZAT MOLLAFKI

TEŞEKKÜRLER
SPAŞİ
نقدم جزيل الشكر لـ
İLKER ŞEKERCİOĞLU

“Bu broşür Avrupa Birliği Sivil Düşün Programı kapsamında Avrupa Birliği desteği ile hazırlanmıştır.
İçeriğin sorumluluğu tamamıyla Eyyüp Epekinci'ye aittir ve AB'nin görüşlerini yansıtmamaktadır.”

Ev vîdeo di çarçoveya Bernameya Ramana Sivil a Yekîtiya Ewropayê ve bi piştgirîya
Yekîtiya Ewropayê hatiye amadekirin. Berpirsiyarîya hemû naveroka xebatê bi giştî
li ser Eyyûp Epekinci ye. Dîtinên Yekîtiya Ewropayê nîşan nade.

GİRİŞ

DESTPÊK

Dünyanın oluşumundan beri, dünya sismik yönden aktif bulunan bölgelerde depremlerin ardışıklı olarak oluştuğu ve sonucundan da milyonlarca insanın ve barınakların yok olduğu bilinmektedir.

Tê zanîn ku ji pêkhatina cihanê heta niha, li heremên ku ji hêla sîsmik ve bitevger in di wan hereman de erdhejiyên rêzîn pêk tîn û di encama van erdhejiyan de jî bi mîlyonan mirov û bi mîlyonan sitargeh tune dibin.

Ülkemiz, depremler açısından dünyanın en aktif bölgelerinden biri üzerinde yer alır. Deprem insanlık için hayati önemi olan bir olgu olup yer bilimleri, eğitim, ilkyardım gibi çok sayıdaki konularla ilintilidir. Deprem, önlenemeyen bir doğa olayıdır.



Welatê me, li cihanê di nav wan heremên ku ji hêla erdhejiyê ve herî çalak in de cih digire. Erdhêjî ji bo mirovahîyê bûyereke gelekî girîng e û bi mijarên wek zanista erdnasîyê, perwerdehî û alîkarîya destpêkî(hawarî) û bi gelek zanistên din re girêdayî ye. Erdhêjî, bûyereke xwezayî ye ku ji hêla mirovan ve nikare bê

rawestandî û pêşî bê lê girtin.




Yıkıcı afetler, önceden haber verip bizi uyarmazlar. Afetlerden en az kayıpla kurtulmanın en etkili yolu bilgi sahibi olmak ve önceden önlem almaktır. Bu doğrultuda toplumsal bilinci artırmak ve olası bir depremden en az zararla kurtulmak için kişilerin deprem eğitimi alması çok önemlidir.

Bobelatên rûxîner, beyî ku pêk werin agahîyê nadin me û me hişyar nakin. Ji bo ku em bikarin xwe ji bobelatan biparêzin û bi xesareke herî kêr xwe ji wan xelas bikin rêbazên herî baş ew in ku mirov di der barê bobelatan de xwedî agahî be û beyî bobelatan pêşgirîyan wergire. Di vê çarçoveyê de ji hêla erdhejiyê ve divê em hişyarîya civakî zêde bikin û ji bo ku em wek civakekê bikarin ji erdhejiyeke gengaz bi xesareke herî kêr xelas bibin jî divê em perwerdehîya erdhejiyê wergirin. Ev her du xal gelekî girîng in.





Dünyanın hiçbir ülkesinde afetlerden hemen sonra sağlık, itfaiye, arama kurtarma ekipleri gibi birimlerin tüm bireylere anında ulaşması mümkün değildir. Afetlerin ilk dakikalarında herkes kendi başınadır. Bizi sadece kendi hazırlığımız ve bilgimiz koruyacaktır. Bu nedenle afet sonrası altın saatler olarak adlandırılan ilk 72 saate herkes hazır olmalıdır.



Li ti welatekî cihanê piştî ku bobelatek pêk hat şûn ve tîmên tendurîstîyê, agirkujîyê û tîmên lêgerîn û xelaskirinê û hwd. di cih de nikarin xwe bigihînin hemû mirovan. Di kêlîyên ewil yên bobelatan de her mirovek bi tena serê xwe ye. Tenê amadekarî û agahîyên me dikarin me biparêzin. Ji ber vê yekê jî divê her kes ji bo 72 saetên ku piştî bobelatekê wek kêlîyên zêrîn tên binavkirin xwe amade bike.

Kitapçığımızda deprem eğitimini üç ana başlıkta inceleyeceğiz:

1. Deprem Öncesi
2. Deprem Sırası
3. Deprem Sonrası

Di pirtûkçeya xwe de em ê perwerdehiya erdehejiyê di nav sê xalên sereke de binirxînin.


1. Berî Erdhejiyê
2. Di Kêlîya Erdhejiyê De
3. Piştî Erdhejiyê



Depremlere sebep olan güç ve depremin oluşumu gibi fiziksel özellikleri ve depremin zararlarından korunma yolları günümüzde en fazla tartışılan konudur. Ancak, korunma yollarını saptanmasının başlıca koşulu, bulunulan sahanın fiziksel özelliklerini iyi tespit edebilmekten geçer. Bu aynı zamanda korunmanın temel ilkelerini de belirler. Bu temel ilkeler:

Di roja me ya îroyîn de; hêz û taybetmendîyên fîzîkî yên ku dibin sedemên erdhejiyan û li ber erdhejiyan rêbazên xweparastinê mijarên herî sereke ne ku tên nîqaşkirin. Lê belê, ji bo ku rêbazên xweparastinê bîn diyarkirin merca ewil ew e ku divê taybetmendîyên fîzîkî yên qadê baş bîn peytandin. Ev yek di heman demê de rêgezên sereke yên xweparastinê ji dîyar dike. Ev rêgezên sereke ev in:

1. Yerleşim yerlerinin depremlerin en etkili şekilde hissedildiği fay hatları yakınına kurulmaması,
2. Depremin şiddetini arttıran zeminlere yerleşim kurulmaması,
3. Deprem riski taşıyan bölgelerde, yapıların depreme dayanıklı tarzda yapılması ve çok katlı yapılara izin verilmemesi.



1. Divê li nêzî xetên fayan(şikestî) ku hêza erdhejiyê li van deran gelekî bibandor e ciwarbûn û jîngeh neyên avakirin.
2. Divê li ser erdên ku hêza erdhejiyê zêde dikin avahî û jîngeh neyên çêkirin.
3. Li herêmên ku ji hêla erdhejiyê ve di bin rîskê de bin li van herêman avahiyên ku bî avakirin, ji bo ku xwe li ber erdhejiyê bigirin divê zexm bî çêkirin û her wiha divê destûr neyê dayîn ku avahiyên gelekî bilind û bi tebeqeyên zêde bî avakirin.

Felaketler depremin doğrudan bir sonucu değildir. Temel korunma ilkelerine uyulmamasının dolaylı bir sonucu olarak meydana gelir. Deprem değil, bina öldürür.

Bu temel tedbirlere uyulmaması 2 yeni tedbirin alınması gerekliliğini doğurmuştur. Birincisi; sistemli ve herkese bir deprem eğitiminin verilmesi, ikincisi; mevcut binaların sağlamlığının kontrol edilerek, depreme karşı dayanıklı hale getirilmesidir.

Bu bakımdan, tedbirlerin alınmasının ne kadar önemli olduğu, bir kez daha ortaya çıkmıştır. Depremlerin insana verdiği zararlar düşünüldüğünde, bu zararların ortadan kaldırılması depremlerle yaşamayı öğrenilmekle mümkündür.

Bobelat ne sedemên yekser yê erdhejiyan in. Dema ku li gorî rêgezên serekê yê xweparastinê mirov tevnegerin wek sedemeke neyekser bobelat pêk tîn. Divê bê zanîn ku erdhejî mirovan nakuje, avahî mirovan dikujin.

Ji ber ku li gorî van bergiriyên sereke nayê tevgerandin, bicihanîna du bergiriyên din bi mecburî derketine holê. Ji van bergiriyên a ewil ew e ku; bi awayekî bipergal û ji bo her kesî perwerdehîya erdhejiyê bê dayîn; a duyemîn jî ew e ku; divê avahiyên heyî ji hêla zexmbûyînê ve birêkûpêk bî qontrolkirin û ji bo ku li ber erdhejiyan hilneweşin divê bî pihêtkirin.

Di nav vê çarçoveyê de careke din derdikeve holê ku wergirtina bergiriyên çî qasî girîng e. Dema ku em xesarên erdhejiyê yê ku digihîjin mirovan difikirin divê em bizanin ku; ji bo ku ev xesar bi tevahî ji holê rabin û mirov ji erdhejiyan bi xesarên herî sivik xwe rizgar bikin, rêbaza sereke ew e ku mirov bikarin bi erdhejiyê re hînî jiyaneke hevpar bibin. Ango di nav jiyane de hînî heyîna erdhejiyê bibin û li gorî vê yekê bergiriyên wergirin.

TEMEL BİLGİ VE KAVRAMLAR

TÊGEH Û AGAHÎYÊN SEREKE

Afet toplumun tamamı veya bir kesimi için fiziksel, ekonomik ve sosyal kayıplar doğuran, normal hayatı ve insan faaliyetlerini durduran veya kesintiye uğratan, etkilenen toplumun baş etme kapasitesinin yeterli olmadığı doğa, teknoloji veya insan kaynaklı olaydır.

Bobelat, bûyerên wiha ne ku; di nav civaka ku lê pêk were heke serîpêderxistina wê civakê ne xurt be ji ber sedemên xwezayî, teknolojik an jî mirovî pêk tîn û ji bo tevahîya civakekê an jî beşeke civakê windayîyên fizîkî, aborî û civakî pêk tînin, jiyana asayî û fealîyetên mirovan didin rawestandî û derbirîn.

Afet bir olayın kendisi değil doğurduğu sonuçtur.
Afetin meydana gelmesinde iki temel faktör rol oynar.

1. Bir tehlikenin olması
2. Bu tehlikenin doğuracağı olaydan dolayı riske girebilecek bir yerleşim yerinin, yatırımın ve kültürel varlığın büyük zarar görmesi

Bobelat, bûyera ku pêk tîn e, encamên ku ji ber bûyeran derdikevin holê bobelatê bi xwe re tînin.

Di pêkhatina bobelatekê de du hêmanên sereke xwe nîşan didin:

1. Heyîna xetereyekê
2. Ji ber xeteraya ku derdikeve holê, dibe ku cihekî nîştêcihê, veberhênanên aborî û heyberên çandî zerarên mezin bibînin

Çoğu afetin 3 önemli ortak özelliği vardır:

1. Ani gelişirler
2. Büyük bir bölgeyi etkilerler
3. Gündelik hayatı kesintiye uğratırlar.

Ji bo gelek bobelatan sê taybetmedîyên hevpar û girîng hene:

1. Ji nişka ve pêk tîn
2. Herêmeke mezin di bin bandora xwe de dihêlin
3. Jiyana rojana di careke de derdibirin û didin rawestandî.

Afetlere hazırlıkta; tehlike, risk, zarar görebilirlik ve kapasite kavramlarıyla sıkça karşılaşırız. Bunları kısaca tanımlayalım.

Tehlike: İnsan, çevre ve toplum üzerinde olumsuz etkiler yaratabilecek, doğa, teknoloji ya da insandan kaynaklanan bir fiziksel durumdur (Şekil A).

Risk: Bir tehlikenin afete dönüşme olasılığı ve beklenen olumsuz sonuçlardır (Şekil B).

Zarar Görebilirlik: Ülkelerin, toplulukların, kurumların ve bireylerin tehlikeye maruz kalması, tehlikeyle başa çıkma ve tehlikenin etkilerini azaltma konusunda yeterli kapasitesinin olmamasıdır (Şekil C).

Kapasite: Bir tehlikenin etkilerini tahmin etme, başa çıkabilme ve etkilerinden zarar görmeden ya da en az kayıpla kurtulabilme kapasitesine sahip olunmasıdır. (Şekil D)


Ji bo xwe-amadekirina li ber bobelatan; em gelekî li rastî têgehên xetere, rîsk, îhtîmala zerardîtinê û behremendîyê tîn. Niha em van têgehên bi kurtasî binasin.

Xetere: Rewşeke fîzîkî ye ku ji hêla xweza, teknolojî an jî mirovan ve derdikeve holê û li ser mirovan, hawirdorê û civakê bandorên neyînî pêk tîne. An jî îhtîmala derketina van bandoran bi xwe re tîne. (Şikl A)

Rîsk: Dibêtiya xetereyeke ku derketiye holê vegere bobelatekê û encamên neyînî yê dibe ku derkevin holê ne. (Şikl B)

Îhtîmala Zerardîtinê: Welat, civak, sazî û kes dema ku dûçarî xetereyan bibin û feraseta wan ji bo ji heq derketina xetereyan nîn be an jî bo ku bandorên xetereyan kêmkarin zanîna wan têr neke îhtîmala zerardîtinê derdikeve holê. (Şikl C)

Behremendî/Feraset: Rewşeke wiha ye ku dema mirov bikare bandorên xetereyekê texmîn bike, ji heq xetereyê derkeve, beyî ku zerarê bibîne an jî bi zerareke herî sivik bikare xwe jê rizgar bike ev têgeh tê bikaranîn. (Şikl D)



Dünyanın İçyapısı Jêrxana Navîn a Cihanê


Yaklaşık 4,5 milyar yıl önce tamamen akkor bir halde olan dünyamız, oluştuğu andan bu zamana kadar soğuyarak katmanlı bir küre haline gelmiştir (şekil 4). Bu katmanlara dıştan içe doğru “kabuk”, “manto” ve “çekirdek” adı verilir.

Cîhana me kêmkirî berî çar û nîv mîlyar sal niha bi tevahî tenê di rewşeke şewqdanekê sor (red glow) de bû û ji dema ku pêk hat heta niha bi domana demê re cemidîye û hêdî hêdî bûye gilovereke bitebeqe. Ji van tebeqeyan re ji derve ber bi navê ve: “qaşil”, “manto” (mantle) û dendik tê gotin.

Çekirdek: Derinlere doğru inildikçe sıcaklığı artan yerkürenin en iç kısmıdır.

Manto: Çekirdeğin üzerinde plastik davranış gösteren ve kısmen ergimiş kaya/magmadan oluşmuş tabakadır.

Kabuk: Yerkürenin en dış kısmında bulunan yapısıdır.



Dendik: Di erdgi loverê de ango di cihanê de dema ku ji qaşil ber bi navê ve biçî germahî zêde dibe. Dendik jî cihê herî germ û herî jêra erdgi loverê ye.

Manto: Tebeqeya ku hinek ji magma û zinarên helîyayî pêk hatîye û li ser dendika erdgi loverê xwe wergirtîye û tevgerên plastîk pêk tîne.


Qaşil: Pêkhateyeke erdgi loverê ya ku herî li derve dimîne ye.

Depremler

Erdhêjî

Yerkabuğunu oluşturan **levhaların** birbirine sürtündükleri, birbirlerini sıkıştırdıkları ya da birbirlerinin üstüne çıktıkları bu levhaların sınırları dünyada depremlerin oldukları yerler olarak karşımıza çıkmaktadır.

Lewheyên ku erdgi loverê pêk tînin, xwe tev didin, hev du dijdînin, derdikevin ser hev û bi hev re xwetêdanê pêk tînin. Sînorên van lewheyên jî li ser rûyê cihanê wek cihên ku erdhêjî lê pêk tînin derdikevin beranberî me.



İtilmekte olan bir levha ile bir diğer levha arasında sürtünme kuvveti aşıldığı zaman bir hareket oluşur. Bu hareket çok kısa bir zaman biriminde gerçekleşir ve şok niteliğindedir.

Dema ku lewheyek ji hêla lewheyêke din ve bê dehfdan û di navbera wan de hêza xwetêdanê derbas bibe tevger pêk tê. Ev tevger di demeke gelekî kin de pêk tê û bandoreke heyirî dide.

Sonunda çok uzaklara kadar yayılabilen deprem (sarsıntı) dalgaları ortaya çıkar. Bazen büyük bir deprem olmadan önce küçük sarsıntılar olur. Bu küçük sarsıntılara **öncü depremler** denilmektedir.

Di encamê de pêlên erdhejîyê pêk tînin ku ev pêl dikarin xwe bigihînin cihên gelekî dûr. Carinan berî ku erdhejîyê mezî çêbibe hejanîyên biçûk pêk tînin. Ji van hêjaniyên biçûk re **erdhejîyên serîkêş** tînin gotin.


Yerkabuğundaki kırılmalar nedeniyle ani olarak ortaya çıkan titreşimlerin dalgalar halinde yayılarak geçtikleri ortamları sarsma olayına **deprem** denir.

Lerzên ku ji ber şikestinên di qafikê erdê de ji nişka derdikevin holê piştî ku derdikevin holê şûn ve li ser qafikê erdê belav dibin. Cihên ku jê derbas dibin jî dihejînin. Ji vê bûyera hanê re jî **erdhêjî** tê gotin.

Yer yüzeyi hareketsizmiş gibi görünse de sürekli yer değiştirir, yükselir, alçalır, kıvrılır, bükülür, kırılır. Bu durum kayalar üzerinde büyük bir gerilim oluşturur. Milyonlarca yılı kapsayan geniş zaman aralıklarında bu gerilimle biriken enerji, kayaların en zayıf noktalarındaki **faylanma** denilen kırılmalarla aniden boşalır.

Her çi qas rûyê erdê wek ku bêtevger xuya bike jî dilebite û tim cih vediguhezîne. Ango bilind dibe, nizm dibe, xwe ba dide, ditewe û dişike. Ev yek jî vêkeşaneke mezin li ser zinaran pêk tîne. Enerjiya ku ji ber van vêkeşanan pêk tê bi domana demeke wek bi mîlyonan salan xwe kom dike û pişt re ji nişka ve cihên herî qels ên zinaran dişikîne û ji vê derê xwe vala dike. Cihê ku dişike û xwe jê vala dike jî wek **xetên fayan** tê binavkirin.

Açığa çıkan enerjilerin içinde dalgalar halinde yayılır, geçtikleri ortamları (değiştirir) deforme eder ve yeryüzünü sarsar. Bu olay deprem olarak adlandırılır. Depreme yer sarsıntısı, zelzele ya da sismik faaliyet de denir. Bu sırada yeryüzünde, bazen gözle görülebilen, kilometrelerce uzanabilen ve fay adı verilen arazi kırıkları oluşabilir. Bu kırıklar bazen yeryüzünde gözlenemez, yüzey tabakaları ile gizlenmiş olabilir.



Enerjiya ku derdikeve holê pêl bi pêl belav dibe, cihên ku jê derbas dibe diguherîne, bêteşe dike û rûyê erdê dihejîne. Ev bûyer wek erdhêjî tê binavkirin. Ji bo erdhêjîyê; erdlerzî, bûmelerzî, zelzele an jî fealîyetên sîsmîk jî tê gotin. Di kêlîya erdhêjîyê de (carinan mirov dikare bi çavên serê xwe jî bibîne) şikestinên erdê yên ku wek fay tên binavkirin pêk tên û dibe ku bi kîlometreyan dirêj bibin û cihekî gelekî mezin bixe bin bandora xwe. Ev şikestinên ku tên qalkirin carinan jî li ser rûyê erdê xuya nabin. Ji hêla tebeqeyên erdê ve tên nixumandin. Divê bê zanîn ku nedîtina wan nayê wateya tunebûna van xetan.

Depremler kısa sürede meydana gelir ve geniş bir alanda hissedilebilir. Nerede ve ne zaman ortaya çıkacağı ise gün ve saat olarak bilinemez.

Erdhêjî di demeke gelekî kin de pêk tên û dibe ku bandorî qadeke gelekî berfireh bikin. Mirov nikare pê derxîne bê ka dê kengî, li ku derê, di kîjan roj û saetê de dê pêk were. Ev yek nayê zanîn.

Ûlkemizin hemen her yerinde depremler olmaktadır; ancak hasara neden olan depremler başlıca üç bölgede yoğunlaşmaktadır. Bunlar; Kuzey-Kuzeydoğu bölgesi, Batı Anadolu bölgesi ve Doğu-Güneydoğu Anadolu bölgesidir.

Li welatê me hima hima li her deverî erdhêjî pêk tên lê belê erdhejîyên ku zararên mezin pêk tînin jî li sê herêman zêdetir pêk tên. Ev herêm jî ev in: Herêma Bakur-Bakurêrojhilat, Herêma Anatolyayê û Herêma Anatolyaya Rojhilat-Başûrêrojhilat.



Büyük bir depremden sonra hafif depremler de olur. Bunlara **artçı depremler** denir. Depremler meydana geldikleri yerlerde zaman zaman yangınlara, kimyasal yayımlara, tsunamiye veya deniz basmasına, heyelanlara, kaya düşmelerine de yol açabilir. Bu nedenle, depreme hazırlanırken diğer tehlikeleri de göz önüne almamız gerekir.



Piştî erdhejiyeke mezin erdhejiyên sivik jî pêk tên. Ji van erdhejiyan re jî **erdhejiyên paşhatî** tê gotin. Erdhejî, cihên ku lê pêk tên car caran jî dibin sedemên agirderketin, belavkirinên kîmyewî, tsunamî, lehî, rabûna deryayê, zirzile, ketina latan jî. Ji ber vê yekê dema ku em xwe jî bo erdhejîyê amade bikin divê em xetereyên din jî bigirin ber çav.



DEPREMDEN KORUNMA

PARASTINA LI HEMBERÎ ERDHEJÎYÊ

Afetlerin yıkıcı ve toplum hayatını sekteye uğratan etkileri hemen kendini gösterir. Hayatın normal akışı durur, altyapıda telafisi imkânsız zararlar meydana gelir. Su ve elektrik kesilir; haberleşme sekteye uğrar.

Bandorên bobelatan ên rûxîner û yên ku jiyana civakê di carekê de derdibire di cih de xwe nîşan didin. Birêveçûna asayî ya jiyane disekine, di binesaziyên bajaran de zerarên ku telafîya wan nîn e pêk tîn. Av û ceyran tê qutkirin; ragihandin radiweste an jî ditexile.



Yollar bozular ve ulaşım kesilir. Bu durumda profesyonel ekipler, afet bölgesine ulaşım saatler aldığı için anında müdahale gerçekleştiremezler. Birey ve ailelerin işte böyle durumlar için afetlere önceden hazırlanmış olması gerekir.


Rê xera dibin û veguhastin disekine. Di vê rewşê de jî tîmên profesyonel ji ber ku bi saetan nikarin xwe bigihînin qada bobelatê, di cih de nikarin mudaxile bikin. Tam jî ji ber vê yekê kes û malbat ji bo kêlîyên ku tenê dimînin divê di pêşî de xwe ji bo bobelatan

amade kiribin û bi awayê amadekirî tevbigerin.

Birey ve aile olarak afetlere hazırlanırken, birlikte yaşadığımız tüm engelli gruplar ve özel yardıma ihtiyacı olanlar için de özel önlemler almamız gerekir. Öncelikle aşağıdaki önlemlerle deprem gibi bir afetten doğacak zararları şimdiden azaltmalı, afet anı ve sonrası için de hazırlanmalıyız.

Dema ku wek şexs û malbat em xwe ji bo bobelatan amade bikin; Divê ji bo şexs û komên astengdar û yên ku pêwîstiya wan bi alîkariya taybet hene jî em bikarin bergiriyên taybet wergerin û amadehîya xwe ji bo wan jî bikin. Di destpêkê de li gorî van bergiriyên ku li jêrê hatine dayîn divê em zerarên ku dê ji bobelatekê derkevin holê kêmbikin û her wiha ji bo kêlîya bobelatê û piştî wê jî divê em xwe amade bikin.

- Evlerimizin güvenli imar ve yapı kurallarına uygun yapılıp yapılmadığına dikkat etmeliyiz.
- Doğal Afet Sigortası (DASK) yaptırmalıyız.
- Ev içinde Deprem Tehlike Avı yaparak, deprem sırasında kayıp düşebilecek, devrilerek ya da kırılarak yaralanmamıza neden olabilecek eşyaları belirlemeli, bunların yerini değiştirmeli ve sabitlemeliyiz.
- Evimizdeki güvenli ve tehlikeli yerleri belirlemeliyiz.
- Depremden önce Afet Çantası'nı ve Aile Afet Planı'nı hazırlamalıyız.
- Deprem sırasında güvenli bir yerde Çök, Kapan, Tutun davranışlarının öğrenmeliyiz.
- Depremden sonra altyapı tesisatlarının kapatılması, ateş kaynağının kullanılmaması ve önceden belirlenmiş olan buluşma yerlerinde toplanmak gibi önlemleri almalıyız.



- Xaniyên ku em tê de dijîn divê li gorî rêgez û zagonên ewle yên îmar û avanîyê hatibin avakirin. Di vê xalê de bi taybetî divê em baldar û haydar bin.
- Divê em Temînata Bobelatên Xwezayî (DASK) çêkin.
- Divê di nava malê de em Nêçîrvanîya Xetereyên Erdhejîyê bikin. Ango divê em lê binêrin bê ka di kêlîya erdhejîyê de kîjan alav dikare bişemite û bikeve, kîjan alav dikare biqulibe an jî bişike û bibe sedem ku em birîndar bibin, divê em van hemûyan diyar bikin û pişt re jî an cihên van biguherînin an jî wan bi diwêr an jî cihekî ku nelivin ve bizelikînin û zexm bikin.
- Divê di nava mala xwe de em cihên ewle û yên xeternak diyar bikin.
- Divê berî erdhejîyê em Çenteyê Bobelatê û Plana Bobelatê ya Malbatê amade bikin.
- Divê di kêlîya erdhejîyê de li cihekî ewle em bikarin bikumişin, xwe bistrênin û xwe bi tiştekî ve bigirin. Lewma berî erdhêjîyê divê em hînî van tevgerên “kumişin, xwegirtin û xwespartinê” bibin.
- Divê piştî erdhejîyê tesîsatên binesazîyan bîn girtin, çavkanîyên agir neyên bikaranîn û divê li cihên hevdîtinê yên ku ji pêşî ve hatine diyarkirin em bîn li hev hev. Bergiriyên wek van gelekî girîng in ku berî erdhejîyan mirov bizane.





**DEPREM ÖNCESİ
BERÎYA ERDHEJİYÊ**

Afet ve acil durumlara karşı hazırlıklı olmak için önceden plan yapmak, ailemizde kimlerin ne zaman nerede nasıl davranacağını belirlemek çok önemlidir.

Ji bo ku em bikarin li ber rewşên bobelatan û rewşên lezgîn amade bin ji destpêkê ve çêkirina planan girîng e. Divê em bizanin ku ji malbata me kî dê kengî li ku derê be û dê çawa tevbigere. Ev xalên amadehayîyê dê di demên bobelatan de ji me re gelekî bibin alîkar.



Afet ve acil durum aile planı hazırlarken okul çağındaki çocuklarda dâhil olmak üzere tüm üyelerin katılımıyla bir aile toplantısı yapılır.

Dema ku em plana bobelat û rewşên lezgîn ên malbatî amade bikin zarokên ku di temenê dibistanê de ne jî tê de bi hemû endamên malbatê re divê civîneke malbatî bê çêkirin û xal tev bi hev re bîn diyarkirin.

Amaç afet ve acil durum planının tüm aile üyeleri tarafından kararlaştırılıp bilinmesi ve plana uygun hareket edilmesidir. Deprem Öncesi; Plan Yapmak ve Hazırlık Önlemleri Almak olarak iki bölümden oluşur.

Di vir de mebest ew e ku; plana bobelat û rewşên lezgîn ji hêla hemû endamên malbatê ve bê destnênşankirin û di kêlîya bobelat û reweşeke lezgîn de her endamekî/eke malbatê bikare li gorî plana amadekirî tev bigere. Beşa Berîya Erdhejîyê ji du xalan pêk tê. Ev xal jî wiha ne: Çêkirina Planê û Bergiriyên Amedehayîyê.

Plan Yapmak


Çêkirina Planan

Depremden zarar görmeden ya da en az zararla kurtulmak için deprem öncesinde hazırlık yapmak şarttır. Deprem hazırlığının temeli; depremin öncesi, sırası ve sonrasındaki tüm uygulamaların planlanmasıdır.

Bo ku mirov ji erdhejîyan zerarê nebîne an jî xwe bi zerareke herî sivik xelas bike berîya erdhejîyan çêkirina planan şert e. Bingeha amadebûna erdhejîyan ew tişt e ku divê xwe bispêre bicihanîna planên berîya erdhejîyê, di kêliya erdhejîyê û piştî erdhejîyê.

A-Evimizde Tehlike ve Risk Tespiti

Afet ve acil durumlara karşı hazırlıklı olmanın en önemli adımlarından birisi de yaşam alanlarımızda bizleri bekleyen risklerin belirlenmesi ve azaltılmasıdır. Örneğin bir deprem sırasında camlar, raflarda bulunan eşyalar, çerçeve ve panolar, avizeler, dolaplar ve ağır eşyalar, beyaz eşyalar, elektrikli ekipmanlar, elektronik eşyalar bizlere zarar verebilir. Binanın kendisi hasar görmemiş olsa bile herhangi bir sarsıntıda devrilebilecek, düşüp kayabileceği ve kırılacak her şey bizim için risklidir.



A-Peyitandina Xeterî û Rîskên Di Mala Me De

Ji bo ku em bikarin li ber bobelat û rewşên lezginî amade bibin xaleke herî girîng jî ew e ku divê em di qadên xwe yê jîyanê de rîskên ku dibe ku derkevin pêşîya me tespît bikin û hewl bidin ku wan kêmbikin. Wek nimûne; di kêliya erdhejîyekê de cam, alavên ku di nav refikan de disekin, çarçove, pano, awîze, dolab, alavên giran, tîkberên spî, ekîpmanên

biceyran û ekîpmanên elektronîk dikarin zerarê bidin me. Heke avahî xesarek nedîtibe jî di kéliya hejinekê de hin alav dikarin bi ser me de bikevin, bişemitin û an jî bişikîn. Ev giş bo me di wê kéliyê de rewşên bi rîsk in.

Bu nedenle evimde tehlike avı yapıp risklerimizi azaltmalıyız. Çünkü ülkemizde depremlerdeki yaralanmaların en az yüzde ellisi ve ölümlerinse yüzde üçü yapısal olmayan risklerden kaynaklanmaktadır. Bunlar eşyaların kullanımından doğan risklerdir.

Ji ber vê yekê jî divê em di malên xwe de derkevin nêçîra xetereyan û rîskên heyî kêm bikin. Ji ber ku di welatê me de birîndarîyên ku di erdhejiyan de çêdibin ji sedî pênciyên wan û mirinên ku çêdibin jî ji sedî sêyên wan ji ber rîsk û sedemên ne binyadî pêk tên. Ev jî ji rîskên bikaranîna alavên di malê de pêk tên.

- **Yapısal Hasarlar:** Binaların deprem etkisiyle hasar alması ve çökmesiyle zarar verebilir.
- **Yapısal Olmayan Hasarlar:** Evlerdeki tehlikeli maddeler, devrilen eşyalar bize zarar verebilir, yangına ve elektrik çarpmasına neden olabilir.
- **Alt Yapı Hasarları:** Yolların hasarı nedeniyle ulaşım, iletişim sistemi, kamu hizmetleri aksayabilir.
- **Xesarên Binyadî:** Ev cure xesar; bi bandora erdhejiyê xesarê didin avahîyan û dibe ku bibin sedem ku avahî bên hilweşandin.
- **Xesarên Nebinyadî:** Hêmanên xeter ên di malê de, alavên ku qelibîbin dikarin zerarê bidin me û bibin sedem ku şewat derkeve an jî bibin sedem ku mirov bi ceyranê ve bimîne.
- **Xesarên Binesazîyê:** Ji ber sedema xerabûn û xesardîtina rêyan dibe ku çûn-hatin, pergala ragihandinê û xizmetên raya giştî bişikîn.



Deprem başka hangi tehlikeleri tetikleyebilir?

Bazı örnekler; artçı depremler, yangın, tehlikeli madde kazası, elektrik çarpması, tsunami, heyelan, çığ.

Erdhêji kîjan xetereyên din dikare bi xwe re bîne?

Hin nimûne; erdhejiyên paşatî, şewat, qezayên hêmanên xeter, bi ceyranê ve mayîn, tsunamî, zirzile, aşî.




Depremden sonra hemen yardım gelmemesi söz konusu olabilir mi?

Olabilir. Depremi geniş bir bölgeyi etkilemesi ve büyük zarar vermesi halinde mevcut müdahale kaynaklarının yetersiz kalması ile olay afete dönüşebilir. Bu durumda 72 saat için yardım gelmemesi söz konusu olabilir.

Gelo piştî erdhejîyê pêkan e ku di cih de alîkarî neyê?

Belê, pêkan e. Dema ku erdhejî bandorê li herêmeke mezin bike û zerarê bide wê heremê û di wê demê de çavkanîyên heyî yên mudaxilekirinê heke kêmbimînîna bûyera pêkhatî vediguheze bobelatê. Di vewerşê de jî pêkan e ku di 72 saetan de jî alîkariyek negihîje we.



B-Planı Hazırlamak

Tehlikeler tespit edildikten sonra, depremin bize verebileceği zararı yok etmek ya da azaltmak için alınması gereken önlemleri deprem sırası ve sonrasında yapılması gerekenleri içeren bir plan hazırlanmalıdır. Temel hedef, planın tüm aile üyeleri ile tartışılarak oluşturulması, daha sonra düzenli aralıklarla eksikliklerin tespit edilerek planın geliştirilmesidir.

B-Amadekirina Planê

Piştî ku xeterê bîn peyitandin şûn ve jî; bo ku em bikarin zerarên ku dê ji erdehejîyan werin ji holê rakin an jî wan zeraran kêmbikin divê em bergirîyên xwe bi awayê plankirî amade bikin. Ev plana bergirîyan jî divê hem bo kêliya erdhejîyê hem jî bo piştî erdhejîyê bê amadekirin. Di van planan de gav bi gav divê bê nîşandan ku dê çi bê kirin. Armanca sereke ew e ku; divê plan bi hemû endamên malbatê re tevî nîqaşên hevpar bê amadekirin û paşê jî dem bi dem kêmasîyên wê bîn tespîtkirin û bi vî awayî jî plan bê xurtkirin.



Hazırlık Önlemleri Almak

Bicihanîna Bergiriyên Amedekariyê

Bu kısım öncelikle iki temel başlık altında incelenmektedir:

Genel Acil Durum Hazırlık Konuları:

Karşılaşılabilecek birçok acil durumda ihtiyaç duyabileceğimiz temel hazırlık konularını içerir. Depremler burada belirtilen acil durumların bir kısmını ya da tümünü bir arada yaratabilir.

Depreme Yönelik Hazırlık Konuları:

Genel risklere ek olarak, özellikle depremlerin salınım hareketi sonucunda oluşan, yapısal ve yapısal olmayan hasarlarına yönelik önlemleri içermektedir. Deprem sırası ve sonrası için depremden önce yapılması gereken hazırlıklar ile çocuklar, yaşlılar, engelliler, dilimizi konuşamayan yabancılar, ev ve çiftlik hayvanları ile ilgili konular da bu başlık altında özetlenmiştir.

Ev beş di serî de di bin du serenavên bingehîn tê nîrxandin:

Mijarên Giştî yên Amadekariyên Rewşên Lezgîn:

Di gelek rewşên lezgîn ên ku pêkan e em bi wan re rû bi rû bimîn de mijarên sereke yên amadekariyê ne ku dema pêwîstî bi wan çêbe bên bikaranîn. Erdhejî dibe ku hemû rewşên lezgîn ên ku li vir tîn qalkirin bi xwe re bînin an jî bibin sedem ku hin ji van rewşên lezgîn pêk werin.

Mijarên Amadekariyê yên Bo Erdhejiyan:

Ji bilî rîskên giştî, erdhejî nexasim bi tevgerên hejandinê xesarên binyadî û yên nebinyadî bi xwe re tînin. Lewma ev mijarên ku li vir tîn qalkirin jî, bo bergirî li ber van xesaran bên girtin hatine amadekirin. Di kêliya erdhejî û piştî erdhejiyan de amadekariyên ku berî erdhejiyan divê bên çêkirin, mijarên ku bi zarok, kal û pîr, astengdar, biyanîyên ku bi zimanê me nizanin, heywanên malê, sewalên ku tîn xwedîkirin ve girêdayî ne û di bin vê serenavê de hatine komkirin û bi kurtî dê qala wan bê kirin.

Genel Acil Durum Hazırlık Konuları

Mijarên Giştî yên Amadekariya Rewşên Lezgîn

Depreme hazırlanmak, genel acil durumlara hazırlanmayı da kapsar. Deprem sırasında ne yapacağımızı biliyor olabiliriz ama ilk yardım bilmiyorsak deprem sırasında yaralılara yetersiz kalabiliriz. Onlara yardımcı olamamamız, hazırlığımızın yetersiz olduğu anlamına gelir.

Amedkarîya ku bo erdhejîyê bê kirin di nav xwe de amadekariyên bo rewşên lezgîn jî dihewîne. Dibe ku di kêliya erdhejiyê de em zanibin em ê çi bikin lê heke em di derbarê alîkarîya destpêkê ya nojdarîyê de em ne xwedî agahî bin wê demê em ê nikaribin

alîkariyeke di cih de bidin birîndaran. Heke em nikaribin alîkarîyê bidin birîndaran jî divê em bizanin ku amadekarîya me kê maye.

Tüm aile bireyleri hep birlikte tehlikeleri tespit edin, riskleri belirleyin fazla eşyalarınızı azaltın, sakladığınız boya, tiner ve benzeri yanıcı maddeleri tutmayın. Düşerek yolunuzu kapatabilecek eşyaların yerini değiştirin. Eşyalarınızı sallantıya karşı sabitleyin. Tehlike avı yaparken güvenli yerleri de belirleyin. Böylece deprem sırasında durabileceğiniz yerlerin sayısını da arttırmış olursunuz.

Wek hemû endamên malbatê; bi hev re xetereyan tespît bikin, rîskên heyî destnîşan bikin, alavên xwe yên zêde kê m bikin, alavên ku şewat ji wan pêk were yên wek boyax û tînerê di nava malê de nehêlin. Alavên ku di dema bezînê de bibin sedema ketina we ji ber rêya xwe rakin û cihên wan biguherînin. Bo ku alavên mala we nelivin wan bi cihekî ve baş asê bikin û cihên wan zexm bikin. Dema ku hûn nêçîra xetereyan bikin cihên ewle diyar bikin. Bi vî awayî ji bo kêliya erdhejiyê hûn ê hejmarê cihên ewle zêde bikin.

- AFAD Acil uygulamasını cep telefonunuza indiriniz. Afet öncesinde, afet anında ve afet sonrasındaki ihtiyaçlarını tek uygulamada karşılamak amacıyla “AFAD Acil” mobil uygulaması geliştirildi. App Store ve Google Play uygulama mağazalarından indirilebilirsiniz.

Sepana AFAD Acilê daxînin telefona xwe ya mobîl.

Bo ku hûn bikarin pêwîstiyên xwe yên berî bobelatan, di kêliya bobelatan û piştî bobelatan ji yek cihî peyda bikin Sepana mobîl ya bi navê “AFAD Acil” hatiye dahêrandin. Hûn dikarin ji firoşgehên mobîl ên App Store û Google Playê daxînin telefonên xwe yên mobîl.



- AFAD Acil mobil uygulamasının tek tuşla Acil Çağrı fonksiyonu, bu sorunu ortadan kaldırıyor. Acil çağrı görüşmesinin internet üzerinden yapılabilmesine, konum servisleri ile arayan kişinin bulunduğu noktanın tespit edilmesine olanak sağlar. Böylece telefon hatlarında oluşabilecek yoğunluğun önüne geçilmesi hedefleniyor.

Di sepana mobîl a bi navê AFAD Acil de fonksîyona bi yek tûşê “Acil Çağrı” vê pîrsgîrêkê ji holê radike. Bi saya vê fonksîyonê mirov dikare hevdiîta lezgîn li ser înternetê pêk bîne, servîs û agahîyên cihên kesê/a ku telefon dike jî dîsa bi saya fonksîyona vê sepanê diyar dibe. Bi vî awayî jî armanc ew e ku di kêliya bobelatê de li ser xetên telefonan pîr zêde lêgerîn pêk neyên û ev xet neyên girtin.




- AFAD Acil kullanıcıları, tek tuşla 112 Acil Çağrı Merkezi'ne ulaşarak durumlarını bildirebiliyor, yardım taleplerini iletebiliyorlar. Ayrıca afet anında sesli görüşme imkânı olmayanlar için uygulama içindeki hazır mesajları kullanarak iletişim kurabiliyorlar.

Bikarhênerên AFAD Acilê, bi yek tûşê dikarin xwe bigihînin Navenda Bangewazîya Lezgîn a 1-1-2yê û bi vî awayî jî dikarin rewşa xwe ya lezgîn ragihînin û daxwaza alîkarîyê bikin. Her wiha di kêliya bobelatê de ji bo kesên ku derfeta wan a axaftina bi deng nîn be ji di nava sepanê de peyamên amadekirî hene û bikarhêner bi saya van peyman jî dikarin ragihandinê pêk bînin.



- Toplama alanları; insanların, afetin ilk saatlerinden itibaren tehlike ve risklerden uzak güvenli bir şekilde bir araya gelebilecekleri alanlardır. AFAD Acil mobil uygulamasının ana ekranında bulunan harita üzerinde gösterilmektedir. Vatandaşlarımız uygulama üzerinden kendilerine en yakın toplanma alanını bularak, bu noktaya yol tarifi olarak ulaşabileceklerdir.


Qadên Kombûnê ji bo ku ji saetên ewil ên bobelatan şûn ve mirov bikarin xwe ji xetere û rîskên heyî biparêzin û di ewlehiyê de li hev kom bibin tên bikaranîn. Cihên van qadan jî di nexşeya ku di sepana mobîl a AFAD Acilê de li ser rûpela ewil de ye tê nîşankirin. Hemwelatîyên me li ser vê sepanê dikarin qada herî nêzîk a li hev kombûnê peyda bikin û bi nîşankirina rê dikarin xwe bigihînin wê derê.



- Her an ihtiyaç duyabileceğimiz acil telefon numaralarını ve bu numaraların nasıl aranması gerektiğini öğrenmektir. Çocuklarımıza da 1-1-2 Acil Çağrı'nın nasıl aranması gerektiğini öğretin.


Divê em hejmarên telefonên lezgîn ên ku her dem bi kêrî me werin û her gav ji me re pêwîst bibin jî baş hîn bibin û bizanin em ê çawa li van telefonan bigerin. Zarokên xwe jî hîn lêgerîna telefona Bangewazîya Lezgîn 1-1-2yê bikin.

- Kırılarak bizlere zarar verebilecek pencerelerin, gerekmedikçe tül ve perdelerini kapalı tutmak, mümkünse camları filmle kaplamak, evde terlik kullanmak, yatak kenarında terlik bulundurmak gibi önlemler almalıyız. Deprem tehdidi altındaki bazı ülkelerde kullanılan yöntemlerden biri, yatağın ayaklarından birine, içinde yedek terlik, fener, pil, düdük ve su







bulunan
naylon bir
torbayı
bağlamaktır.




Şibakeyên ku di erdhejiyekê de dibe ku bişikîn, divê heta ku hewce neke em tûl û perdeyên wan girtî bihêlin û heke pêkan be jî camên wan bi fîlman bipêçin. Divê em bergiriyên wek di nav malê de bikaranîna şimikan û li kêleka cihê razana xwe hiştina şimikan jî bi cih bînin. Li hin welatên ku di bin xetereya erdhejiyan de ne rêbazeke ku tê bikaranîn jî wiha ye: Bi pêyekê karyolaya xwe ve poşetekî naylon girê didin an jî poşetê dixin bin karyolaya xwe ku di nav vê poşetê de jî alavên wek şimik, fanos, pîl, pîpik û av hene.




- İlk Yardım eğitimi almalı, ev, işyeri ve araçlarımızda ihtiyaç duyabileceğimiz ilk yardım malzemelerini bulundurmalıyız. Tüm acil durumlar için evlerimizde bulundurabileceğimiz temel ilk yardım malzemelerini eczanelerden temin edebiliriz.



Divê em perwerdehîya alîkarîya destpêkê ya nojdarîyê wergirin û di nav malên xwe, li kargehên xwe û di nav erebeyên xwe de hin alavên pêwîst ên alîkariya destpêkê jî bi cih bikin. Ev alavên alîkarîya destpêkê yên ku di hemû rewşên lezgîn de mirov dikare bi kar bîne û li mala xwe bi cih bike jî ji dermanxaneyan mirov dikare peyda bike.






- Depremler; ocakları, sobaları devirerek, gaz borularını kırarak, yangınlara sebep olabilir. Yangın söndürme malzemelerini temin etmeli ve kullanmayı öğrenmeliyiz. Ayrıca yangın tahliye yollarını saptamalı ve açık tutulmalarını sağlamalıyız.

Erdhejî; dikare tifik û sobeyan biqelibîne, lûleyên gazê bişkîne û bi vî awayî jî bibe sedema şewatekê. Lewma jî divê bo tefandina şewatê em alavên temirandina şewatê jî peyda bikin û hîn bikaranîna wan bibin. Her wiha divê rêyên tehliyyên agir em destnîşan bikin û hewl bidin ku wan rêyan vekirî bihêlin.

- Evimizde bulunan elektrik, su, gaz gibi tüm tesisatların yerlerini ve açma kapama pozisyonlarını öğrenmeliyiz.



Cihên tesîsatên ceyran, av û gazê yên ku di nava malê de ne divê em baş destnîşan bikin û pozîsyonên girtin û vekirina wan em jî em hîn bibin.



- Evimizdeki ilaç, boya, tiner, tuz ruhu, çamaşır suyu gibi tehlikeli maddelerin ihtiyacımızdan fazlasını bulundurmamalım. Tuz ruhu ve çamaşır suyu gibi bir arada olması halinde risk yaratacak maddeleri ayrı yerlerde saklamalıyız.

Li mala xwe xirûmirên xetere yên wek derman, boyax, asîda hîdroklorîk (tuz ruhu), tîner û ava kincan ji pêwîstîya xwe zêdetir divê em neveşêrin û nehêlin. Hin hêmanên kîmyevî (wek asîda hîdroklorîk û ava kincan) yên ku dema bigihîjin hev xetereyek derkeve holê divê li gel hev neyên veşartin û ji hev bînin.

DEPREME YÖNELİK HAZIRLIK KONULARI MÎJARÊN JÎ BO AMADEHÎYÊN ERDHEJÎYÊ

1. Yapısal Tehlikeler

1. Xetereyên Binyadî

Înşaat yönetmeliklerine uygun yapılmış yapılar, olası depremlerde hasar alabilirler ancak yıkılmazlar. İnşaat yönetmeliklerine uygun yapılmamış bir binanın olası bir depremde yıkılıp yıkılmayacağına dair hiç kimse, hiç bir koşulda teminat veremez. Bu nedenle;

Avahîyên ku li gorî rê û rêçikên avahîsazîyê hatibin çêkirin di erdhejîyeke ku pêkan e çêbe de dikare xesarê bibîne lê dibe ku bi tevahî hilneweşin. Lê li gel vê yekê avahîyên ku li gorî rê û rêçikên avahîsazîyê nehatibin çêkirin jî di erdhejîyeke pêkan de qet diyar nabin ku ka dê hilweşin an jî hilneweşin. Tu kes di tu şert û mercê de nikare mîsogerîya vê yekê bide ku ev avahî dê hilneweşin. Ji ber vê yekê jî;

- Oturduğumuz ya da taşınacağımız binaların inşaat yönetmeliklerine uygun yapılar yapılmadığını öğrenmeliyiz. Eskiden inşa edilmiş yapıların, deprem yönetmeliğine uygunluğu testlerle anlaşılır. Yapının yönetmeliğe uygun olmadığı anlaşılması halinde, yeniden yapma ya da güçlendirme yoluna gitmemiz hayati önem taşır.

Divê em hîn bibin bê ka avahîyên ku em lê dijîn an jî avahîyên ku em ê malên xwe bar bikin li gorî rê û rêçikên avahîsazîyê hatine avakirin an na. Avahîyên ku berê hatine avakirin guncanbûna wan a li hemberî erdhejîyê bi hin testan diyar dibin. Heke diyar bibe ku avahî ne li gorî rê û rêçikên avahîsazîyê hatine avakirin jî divê ew avahî an jî nû ve were lêkirin an jî bi rêya xurtkirinê divê avahî bê qewînkirin. Ev yek ji bo jiyana me gelekî girîng e.


- Yapacağımız yeni binaları inşaat yönetmeliğine uygun yapmalıyız.

Avahîyên ku em ê nû çêkin divê em li gorî rê û rêçikên avahîsazîyê lê bikin.

2. Yapısal Olmayan Tehlikeler

2. Xetereyên Nebinyadî

17 Ağustos 1999 depremi sonrasında Boğaziçi Üniversitesi tarafından yapılan araştırmada; deprem sırasındaki can kayıplarının %3'ünün ve yaralanmaların %50'sinin eşyaların devrilmesi, cam kırılmaları ya da tesisatlarda gerçekleşen sorunlardan kaynaklandığı bildirilmiştir. Bu doğrultuda aşağıda önerilen hazırlık uygulamalarını gerçekleştirmeliyiz:



Piştî erdhejiya 17ê Tebaxê ya ku di sala 1999an de pêk hatibû, Zaningeha Bogaziçî lêkolînekê çêdike. Li gorî vê lêkolîna ku çêkirine; diyar dibe ku piştî erdhejiyê kesên ku jiyana xwe ji dest dane ji sedî sêyên wan (%3) û kesên ku birîndar bûne jî ji sedî pêncîyê wan (%50) ji ber ku

di kêliya erdhejiyê de alavên malê qelibîne ser wan, ji ber ku şibakên malê bi ser wan de xirûcîne û an jî pirsgirêkên ku di tesîsatên de qewimîne jiyana xwe ji dest dane an jî birîndar bûne. Di vê çarçoveyê de divê em xalên amadebûyîne yê ku li jêr hatine pêşniyarkirin bi cih bînin:

- Koltuk, kanepê, çekyat gibi mobilyaları cam kenarlarından ve üzerimize devrilebilecek cisimlerden uzakta konumlandırmalıyız.


Mobilyayên mîna paldank, qenepe, soyma û textebendan divê em ji kevîkên şibakeyan û ji alavên ku îhtimala qelibandîna wan hebin

dûr bixin û li cihekî ewle wan bi cih bikin.



- Ağır cisimleri, dolapların alçak raflarına yerleştirilmeliyiz.

Alavên giran divê em di refên herî jêr ên dolaban de bi cih bikin.



- Dolap, kütüphane, mutfak dolabı, elbise dolabı gibi yüksek mobilyalar ile beyaz eşyaları arkasındaki duvara sabitlememiz deprem anında devrilmelerini engelleyecektir. Tüm sabitleme işlemleri sırasında çivi yerine vida ve dübel, resim asmada ise kancalı vida ve dübel kullanmalıyız.


Alavên mîna dolab, pirtûkxane, dolabên pêjgehê, dolaba kincan û mobîlyayên bilind û giran divê em bi dîwarê pişt wan ve bizeliqînîn. Bi vî awayî di kêliya erdhejyê de ev alav dê bi ser me de neqelibin. Dema ku em van alavan bi dîwarê pişt ve girê bidin jî li şuna bizmar em vîde û dubelan bi kar bînin baştir dibe. Her wiha dema ku em bixwazin wêne û nîgaran jî bi dîwaran ve vekin em bikarin vîdeyên badayî û dubelan bi kar bînin baştir dibe.



- Eşyalar dolapların içinden düşerek zarar verebilirler. Kapaklı dolaplar için kilitli kulplar bulunması, eşyaların dökülmesini ve zarar vermesini engelleyecektir.


Alavên ku di nav dolaban de ne di dema erdhejyê de dikarin bikevin û zerarê bidin me. Lewma jî ji bo dolabên ku devkê wan heye divê em çimbil an jî destikê wan çêkin. Bi vî awayî em ê bibin asteng ku di dema erdhejyê de ev alav ji nava dolaban bikevin ser me û zerarê bidin me.







- Basınçlı gaz içeren LPG mutfak tüpü, oksijen tüpü vb. tüm tüpleri rahatça söküp takabilecek ancak kazayla açılmayacak şekilde duvara sabitlememiz gerekmektedir.

Divê tûpên pêjgehê yên ku LPG di nav wan de hene, tûpên oksîjîne û her wekî din hemû tûpên ku gaza bifişar tê de heye bi dîwar ve werin vekirin. Lê belê dema ku bi dîwar ve bên vekirin jî divê bi awayekî hêsanî mirov bikaribe veke û bigire lê her wiha divê jixweber bi qezayekê jî venebin.



- Deprem sırasında devrilerek yangına ve gaz zehirlenmesine neden olmaması için sobaları yere, borularını ise tavan ve duvarlara sıkıca sabitlemeliyiz.

Ji bo ku di kêliya erdhejiyê de neqelibin û nebin sedema bijehrketina gazê divê em sobeyên xwe li erdê û lûleyên wan jî bi tavanê ve baş asê bikin. Heke na di kêliya erdhejiyê de dê biqelibin û dibe ku gaza ku jê derkeve bibe sedem ku em bi jehrê bikevin.



- Tavanda avize olarak nispeten hafif ve zor kırılan modelleri tercih etmeliyiz. Doğru şekilde dübel ve çengel vida ile monte etmemiz halinde bunların düşme riskini azaltabiliriz.

Li binbanê xanî wek awîze jî heta ji destê me bê divê em modelên sivik û yên ku zû bi zû neşikin hilbijêrin. Heke em bi awayekî baş bi dubel û bi vîdeyan van awîzeyan monte bikin dê îhtîmala ketina wan kême bibe.


- Pencereleerîn dîşîna herhangî bir sabitleme olmaksızın konulan saksı gibi malzemeler, bir deprem sırasında düşerek, aşağıda bulunan kişilere zarar verebilir. Bu nedenle pencere dışına aşağıya düşebilecek malzemeleri koymamalı ya da koyduklarımızı sabitlemeliyiz.

Guldankên beyî ku bên zexmkirin li hêla derve ya şîbakeyan bên danîn di dema erdhejiyekê de dikarin biqelibin û zerarê bidin kesên ku li jêr in. Lewma jî an divê em alavên ku îhtîmala ketina wan hene nedeynin derve ber şîbakeyan an jî heke em deynin jî divê em wan zexm bikin ku nekevin.




- İşyerlerindeki bilgisayarların kasalarını yer seviyesinde tutmamız ve masa üzerindeki monitörleri sabitlememiz, olası maddi hasarın azalmasına yardımcı olacaktır.

Qeseyên kompîtirên xwe yê li cihê kargehê divê em li erdê bihêlin û monîtorek ku li ser maseyan in jî divê em bi maseyê ve bizeliqînin. Bi vî awayî em ê bibin asteng ku zerarên madî pêk werin.




Depreme Karşı Yapısal Olmayan Risklerin Azaltılması Li Hemberî Erdhejiyan Kêmkirina Rîskên Nebinyandî

- Ev ortamında elektronik eşyaların üzerimize düşmesiyle veya bir mobilyanın altında kalarak yaralanmış olabiliriz. İşyerlerinde ise yüksekte stoklanmış ürünlerin üzerimize düşmesiyle yaralanabilir veya can kaybına uğrayabiliriz. Belirtilen örnekleri çoğaltmamız mümkündür. Yaşanan tüm depremlerde yapılar sallanır ve bu yüzden yapıların içinde boyutları itibariyle devrilebilecek durumda olan tüm eşya veya cihazlar devrilebilir, bu tip eşyaların çevresinde bulunan canlılar yaralanabilir ya da yaşamını yitirebilir. Yine bu yüzden tüm bu eşyalar devrilerek maddi kayıplara neden olabilir.



Li malê di kêliya erdhejiyê de dibe ku bi ser me de alaveke elektronîk biqelibê an jî em di bin mobilyayekê de bimîn û vî awayî birîndar bibin. Li kargehê jî alavên ku li cihên jor hatibin hêlandin dibe ku bi ser me de bikevin û bi vî awayî em birîndar bibin an jî jiyana xwe ji dest bidin. Mînakên wiha em dikarin gelekî zêde bikin. Di hemû

erdhejiyên ku pêk tên de avahî dihejin û ji ber vê hejandinê jî alavên ku ji hêla giranbûn û mezinbûna xwe ve ihtîmala qelibandina wan hebin dikarin biqelibin. Ji ber qelibandina van alavan jî kesên ku nêzî wan bin dikarin birîndar bibin an jî jiyana xwe ji dest bidin. Dîsa ji ber vê hejandinê hemû alav dikarin biqelibin û xesareke madî pêk bînin.



Yapısal olmayan elemanlar nelerdir?


Yapıya ait olmayan elemanlar ise binanın sağlamlığından çok, içinin kullanımıyla ilgilidir. Bunlar, yapının içinde bulunduğu duruma göre, hareketli eşyalar ve hareketsiz eşyalar olmak üzere iki grupta incelenir.

Hêmanên ku nebinyadî ne çi ne?

Hêmanên ku ne aîdî avahiyê bin jî ji zexmbûna avahiyê zêdetir bi bikaranîna nava avahiyê ve têkîldar in. Ev hêman jî li gorî rewşa avahiyê wek alavên bitevger û alavên bêtevger di nav du koman de dabeş dibin.

Hareketli Eşyalar: Tüm mobilyalar, elektronik cihazlar, beyaz eşyalar, sobalar, tablolar gibi.

Alavên Bitevger: Hemû mobîlya, amûrên elektrônîk, têkberên spî, sobe, nîgar û hwd.



Yapıya Ait Olmayan Hareketsiz Eşyalar: Yapının içinde bir kereliğine sabitlenip genellikle aynı yerde kalan eşyalardır. Pencere ve kapı doğramaları, asansör, radyatörler, kombi, termosifon, şofben, avize, lambalar, yangın merdivenleri, cam vitrinler, havalandırma sistemleri gibi.

Alavên Bêtevger ên ku ne Aîdî Avahiyê Ne: Ev alav bi piranî di nava avahiyê de li cihekî carekê tîn montekirin û piranî li cihekî xwe dimînin. Wek mîna; depînen derî û şibakeyan, asansor, radyator, kombî, termosifon, şofben, awîze, lembe, derenceyên êgir, wîtrînen cam, kulekên hewadarkirinê û hwd.

Depremde Yapısal Olmayan Elemanların Davranışları

Di Erdhejiyê de Tevgerên Alavên ku Nebinyandî Ne

Günlük yaşantımızı kolaylaştıran, yapıya ait olmayan elemanlar deprem sırasında binaların sallanması ve sarsılması nedeniyle düşebilir, kayabilir, dökülebilir ya da devrilebilir.

Alavên ku jiyana me ya rojane hêsan dikin û ne aîdî avahîyê ne di kêliya erdhejiyên de ji ber ku avahî dihejin û dileqin dikarin bikevin, bişemitin, birijin û bi ser me de biqelibin.

Yapısal olmayan riskler nelerdir?

Yapısal olmayan elemanlar, yer değiştirme eğilimlerinden dolayı depremde maddi kayıplara, yaralanmalara ve hatta ölümlere neden olabilir. Yapısal olmayan elemanlardan kaynaklanan bu tehlike ve risklere “Yapısal Olmayan Riskler” adını veriyoruz.

Rîskên ku nebinyadî ne çi ne?

Alavên nebinyadî, ji ber ku di erdhejiyan de meyla wan cihguherandinê çêdibe dikarin windabûyên madî pêk bînin û her wiha dikarin bibin sedem ku hin kes birîndar bibin û an jî jiyana xwe ji dest bidin. Ev rîsk û xetereyên ku ji ber alavên nebinyadî pêk tînin jî wek “Rîskên Nebinyadî” tînin binavkirin.

Yapısal Olmayan Risklerin Belirlenmesi

Dîyarkirina Rîskên ku Nebinyadî Ne

Deprem sırasında, yapısal olmayan elemanlardan kaynaklanabilecek zararlar düşünülmüş, riskler önceden tahmin edilebilir. Bunun için deprem sırasında devrilebilecek, düşüp kayabilecek, kırılacak yapısal olmayan eşyalar tespit edilir. Riskler önceden belirlenip önlemler alınabilirse, deprem sonrası karşılaşılabilecek zararlar en aza indirilebilir.

Deprem sonrasında yapısal olmayan elemanlardan kaynaklanan riskler şunlardır:

- Maddi kayıp
- Yaralanma
- Ölüm
- İş ve hizmet kaybı
- Psikolojik sorunlar
- Yapısal olmayan eşyalardan kaynaklanan yaralanma sonrası, hemşire ve doktor emeği kaybı

Heke em bikarin li ser zerarên ku kêliya erdhejîyê ji ber alavên nebinyadî dê pêk werin bifikirin em dikarin rîskên wan jî ji pêşî ve hesab bikin. Ji bo vê jî divê alavên nebinyadî yên ku di kêliya erdhejîyê de dikarin bikevin, bişemitin û bişikîn ji pêşî ve bîn tespîtkirin. Heke ev rîsk ji pêşîyê ve bîn diyarkirin û li hemberî wan bergirî bîn girtin wê demê piştî erdhejîyê zerarên ku em bi wan re rû bi rû bimînin jî dê bîn kêmkirin.

Zerarên ku piştî erdhejîyê ji ber alavên nebinyadî pêk werin jî wiha ne:

- Windakirinên madî
- Birîndarbûn
- Mirin
- Windabûna kar û xizmetê
- Pirsgirêkên derûnî
- Birîndariyên ku ji ber alavên nebinyadî pêk werin şûn ve windabûna keda bijîşk û hemşîreyan.

Yapısal Olmayan Risklerin Azaltılması

Kêmkirina Rîskên Nebinyadî



Deprem sonrası oluşabilecek tehlike ve riskler, atılabilecek birkaç adımla veya uzmanından alabileceğimiz teknik destekle azaltılabilir. Yapısal olmayan eşyaların olası bir deprem sırasında zarar vermesini önlemek, yani riskleri en aza indirebilmek için bu tip eşyaların deprem sırasında nasıl devrildiğini, nasıl kaydığını, nasıl düştüğünü, nasıl kırıldığını bilmek ve bu doğrultuda iyileştirme yapmak gerekir.

Xetere û rîskên ku piştî erdhejîyê dê derkevin pêşîya me, bi avêtina çend gavan an jî ji pîsoran wergirtina çend pêşnîyar û piştgiriyên teknîkî dikarin bîn kêmkirin. Ji bo ku ev alavên nebinyadî di erdhejîyê de pêkan de zerarê nedin me û em li hemberî wan zeraran bibin asteng divê em bizanin ku ka alavên wiha di kêliya erdhejîyê de çawa diqelibin, çawa dişemitin, çawa dikevin, çawa dişikîn û li gorî wan zanînan jî divê em gavan biavêjin ku ev rîsk pêk neyên.

Eşyaların Konumunun Değiştirilmesi

Guherandina Cihê Alavan

Yapısal olmayan risklerin azaltılmasında en temel ve aynı zamanda masrafsız yöntem, eşyaların yerlerinin değiştirilmesidir.

- Ağır ve yüksek eşyaları daha güvenli olacağımız alanlara taşımak
- Sürekli oturulan mobilyaları pencerelerden uzak alanlara yerleştirmek
- Camlardan kaynaklanabilecek risklere karşı pencerelerde kalın perde kullanmak
- Raflı mobilyalarda alt raflara ağır, üst raflara daha hafif eşyaları koymak

Di kêmkirina rîskên ku ji ber alavên nebinyadî pêk tîn de gava herî sereke û her wiha ya ku tu lêçûn lê naçe guherandina cihê alavan bi xwe ye.

- Alavên giran û bilind divê em deynin cihên ku em ê tê de ewle bin.
- Mobilyayên ku tim em li ser wan rûdinin divê em li cihekî ku durî şîbakeyan be bi cih bikin.
- Ji ber rîskên ku ji camên şîbakeyan pêk werin divê em di şîbakeyên xwe de perdeyên stûr bi kar bînin.
- Di mobilyayên ku birefik in de divê em alavên giran bixin refên jêr û yên sivik bixin refên jor de û wiha ji jêr ber bi jor ve li gorî giranbûna alavan wan bi cih bikin.

Eşyaların Sabitleenmesi

Zeximkirina Alavan/Bi Cihekî ve Girêdana Alavan

Yapısal olmayan eşyalardan kaynaklanan riskleri azaltmak için en etkili yol, deprem sırasında düşüp kayabilecek, devrilebilecek ve bu nedenle zarar verebilecek eşyaları tekniğine uygun şekilde sabitlemektir.

Ji bo ku em bikarin rîskên ji ber alavên nebinyadî pêk tîn kêmkirin rêya herî bikêr ew e ku; alavên ku di kêliya erdhejîyê de dikarin bikevin û bişemitin, biqelibin û bi vî awayî zararê bidin me li gorî teknîka guncan bi cihekî ve bîn vekirin û bîn zeximkirin.

Sabitleme malzemesinin doğru seçimi ve etkin sabitleme: Eşyalar özelliklerine ve sabitlenecekleri yerlere göre farklı malzemelerle sabitlenir. Amaç, seçilecek sabitleme elemanı yardımıyla eşyayı sabitlendiği yere sıkıca sabitlemektir.

Hilbijartina rast ya materyalên pêvekirinê û pêvekirineke bikêr: Alav, li gorî taybetmendiyên xwe û li gorî taybetmendiyên cihên ku dê pê bîn vekirin bi materyalên cuda tîn zeximkirin. Di vir de armanc ew e ku bi alîkariya hêmana zeximkirinê ya ku dê bê hilbijartin ve ew alav li cihê ku pê ve kirin de zexim bibe û hew bilebite.

Sabitlenmiş eşyanın dengesinin korunması: Sabitlenmesi yapılacak eşyanın dengesini korumak gerekir. Örneğin yüksek sehpalara üzerine sabitlenmiş televizyonla birlikte, sehpaalarının da en yakın duvara yanaştırılarak sabitlenmesi gerekir.

Parastina hevkeşeya alava ku bi cihekî ve hatiye zeximkirin: Alava ku dê bi cihekî ve bê zeximkirin divê hevkeşeya wê jî bê parastin. Wek nimûne; telewîzyoneke ku li ser sêpayekê hatibe zeximkirin divê ew sêpa tevî telewîzyona li serê ve bi dîwarê herî nêzîk ve bê zeximkirin.

Sabitlemeye Başlamadan Önce


Beyî Destpêkirina Zeximkirinê

Deprem sırasında devrilerek, düşerek ya da kayarak risk oluşturabilecek yapısal olmayan elemanların sabitlenmesine başlamadan önce bazı hazırlıkların yapılması gerekir. Uygun bir sabitleme yapabilmek için, bu işleme başlamadan önce şunlara dikkat edilmelidir:

Berî ku em dest bi zeximkirina alavên nebinyadî yên ku di kêlîya erdhejîyê de dikarin biqelibin, bikevin, bişemitin û bi vî awayî hîn rîskan bi xwe re bînin divê em hin amadehiyan bînin cih. Berî ku em dest bi zeximkirineke guncan bikin di destpêkê de divê em li van xalên ku li jêr hatine dayîn baldar bin:

Eşyaların Ağırlığının Bilinmesi


Zanîna Giranbûna Alavan



Sabitlenecek eşyaların uygun bir sabitleme için kullanılacak bağlantı elemanlarının, dübel ve vidaların seçiminde faydalı olacaktır.

Ev yek ji bo hîlbijartina hêmanên girêdanê yên wek dubel û vîdeyan girîng e ku bi saya van hêmanan em ê alavên xwe bi bi cihekî guncan ve zexim bikin û nehêlin ku bilebitin.

Eşyaların Türüne ve Ağırlığına Göre Bağlantı Elemanının Seçimi Li Gorî Cure û Giranbûna Alavan Hilbijartina Hêmanên Girêdanê



Bağlantı elemanları öncelikle sabitlenecek eşyaların cinsine göre seçilir.

Ahşap, sunta, MDF gibi ürünlerden imal edilmiş elbise dolabı, vitrin, şifonyer, komodin, TV sehpası ya da metalden imal edilmiş metal dolaplar L profiller kullanılarak vidalama yapılır.


Beyaz eşyalar, elektronik eşyalar yapışkanlı bantlar yardımıyla kendi üzerlerine yapıştırılarak duvara dübel ve vida yardımıyla vidalanarak sabitlenir.

Di serî de hêmanên girêdanê li gorî cureyên alavên ku dê bên zeximkirin tên hilbijartin.

Alavên ku ji materyalên textîn, sunta an jî MDF hatine çêkirin ên wek dolabên kincan, camekan, şifonyer, komodîn, sêpaya telewîzyonê an

jî alavên ku ji materyalên hesin û metalî ve hatine çêkirin ên wek dolabên metal, bi metoda bikaranîna profîla Lyê ve tên vîdekirin.

Têkberên spî û alavên elektronîk jî bi alîkarîya bandên zelîqonk ve pêşî li ser xwe divê bên zeliqandin û piştê jî bi dubel û vîdeyan ve divê bi dîwar ve bên vîdekirin û bi vî awayî divê ji cihê xwe nelivin.





Plastik Klipsli Şerit

Terîşa Biklîps a Plastîk

Çok ağır olmayan, masa üstünde bulunan elektronik cihazlar için, plastik klipsli şeritlerin kullanılması önerilmektedir. Bilgisayar kasası ve monitörü, küçük televizyonlar, küçük ve orta boy elektronik eşyalar gibi.

Ji bo alavên elektronîk ên ku zêde ne giran in û li ser maseyan disekinin bo ku ji cihê xwe nelivin bikaranîna terîşên biklîps ên plastîk tên hilbijartin. Wek nimûne; qaseya kompîtirê, telewîzyonên biçûk, alavên biçûk û navîncî yên elektronîk û hwd.



Sabitlenmede Kullanılacak Dübel ve Vidaların Seçimi

Di Zeximkirinê De Hilbijartina Dubel û Vîdeyên ku Dê Bê Bikaranîn

Sabitlenme için kullanacağımız dübel ve vidalar, sabitleyeceğimiz eşyaların türüne, ağırlığına, sabitleme göre değişir. Metal eşyalar, ahşap eşyalar, MDF veya suntadan yapılmış eşyalar için ayrı ayrı vidalar kullanılır.

Dubel û vîdeyên ku ji bo zeximkirinê em ê bi kar bînin li gorî cure û giranbûna alava ku em ê bi cihekî ve zexim bikin û li gorî metoda zeximkirina me dê biguhere. Ji bo alavên metal, alavên textîn, alavên ku bi MDFê hatine çêkirin an jî yên ku ji suntayê hatine çêkirin vîdeyên cuda cuda tên bikaranîn.

Sabitlenmede Kullanılacak Vidanın Seçimi

Hilbijartina Vîdeya ku Di Zeximkirinê De Dê Bê Bikaranîn


Bağlantı elemanının eşyaya sabitlenmesinde kullanılacak vidanın seçiminde, sabitlenecek eşyanın hangi malzemeden üretildiği bilinmelidir. Örneğin ağaçtan üretilmiş mobilyalar için “ağaç vidası”, MDF veya suntadan üretilmiş mobilyalar için “sunta vidası”, metalden üretilmiş mobilyalar için “metal vidası” kullanmak en doğru tercih olacaktır.


Dema ku em bixwazin hêmanekê bi alavekê ve girê bidin divê em bizanin ew alava ku em ê hêmanê pê ve bikin ji çi materyalê hatiye çêkirin û vîdeya ku em ê di wê girêdanê de jî bi kar bînin divê em li gorî vê yekê hilbijêrin. Wek nimûne; ji bo mobilyayên ku ji daran hatine çêkirin divê em “vîdeyên daran”, ji bo yên ku ji MDF an jî sunta hatine çêkirin jî “vîdeyên suntayê”, ji bo alavên ku ji hesin hatine çêkirin jî “vîdeyên metalî” hilbijêrin. Ev hilbijartin dê tercîhên herî rast bin ji bo girêdanekê.

Delik Delme Aşamaları

Gavên Vekirina Qulikan

Delik delme işlemine geçilmeden önce, delinecek duvarın iyi taranması gerekir. Duvarların görünmeyen kısımlarındaki elektrik ve su tesisatları bu işlem sırasında zarara uğrayabilir.







Berî ku em dest bi vekirina qulikan bikin pêşî dîwarên ku em ê qulan tê de vekin divê em baş sehî bikin. Ji ber ku di piştî dîwaran de, di cihên ku bi çav nayên dîtin de dibe ku tesîsatên av û ceyranê hebin û di vekirina van qulan de dibe ku em zerarê bidin wan. Lewma pêşî divê em dîwarê xwe sehî bikin ka li piştî tiştêkî wiha heye an tune ye.

Dolap Kapakları ve Çekmeceler için Sabitleme Elemanları Ji bo Devkên Dolaban û Berkêşkên Wan Hêmanên Pêvekirin û Zeximkirinê

Özellikle içlerinde ağır eşyalar bulunduran mobilyaların dolap kapakları ve çekmecelerinden kaynaklanan risklerinin azaltılmasında, mekanik kilitler kullanılmalıdır. Çocuk güvenlik kilitlerine de başvurulabilir. Çocuk güvenlik kilitleri mutfak dolap kapakları, mutfak çekmeceleri, elbise dolap kapakları, vitrinlerin kapakları, buzdolabı kapağı gibi eşyaların uygun yerlerine kolayca sökölüp takılır.

Bi taybetî mobilyayên ku alavên giran di nav xwe dihewînin ji bo rîskên ku ji wan pêk werin bîn kêmkirin divê ji bo devik û berkêşkên wan mifteyên mekanîk bîn bikaranîn.

Her wiha ji bo ewlehîya zarokan mirov dikare mifteyên taybet ên ku zarok nikaribin vekin jî bi kar bîne. Mirov dikare mifteyên ji bo ewlehîya zarokan bi hêsanî li cihên guncan ên devikên mîna alavên dolab, camekan û sarincê, berkêşkên pêjgehê, devikên dolabên kincan bide û dîsa jê derxîne.



Duvarda veya Tavanda Asılı Duran Eşyalar

Alavên ku bi Dîwar an jî Binbanê Malê ve Daleqandîne

Duvarda veya tavanda asılı duran, orta büyüklükteki tablolar, tavana asılı bitkiler, avizeler, aynalar, duvar saatleri gibi eşyaların metal S kancaları yardımıyla buldukları zemine sabitlenebilir.



Mirov dikare alavên mîna nîgarên ku mezinbûneke wan a navîncî hene, nebatên ku bi binban ve daleqandîne, awîze, neynik û demjimêrên dîwaran bi alîkarîya çingalên metalî yên mîna tîpa S li cihê ku lê ne ve bizeliqîne û cihê wan zexim bike.



Seramik, Cam ve Diğer Kırılabilir Küçük Eşyalar

Seramîk, Cam û Alavên Din ên Ku Dibe Ku Bişikin



Deprem sırasında buldukları yerlerde devrilerek veya kayarak kırılacak camdan veya seramikten üretilmiş küçük boy vazo, biblo veya bunlara benzer süs eşyalarının tehlikelerinin azaltılmasında “deprem mumu” adı verilen macunumsu yapışkanlı bir malzeme kullanılabilir.



Guldankên biçûk ên ku ji cam an jî seramîk hatine çêkirin û di kêlîya erdhejîyê de ihtîmala şemitandin û bi vî awayî ketin û şikestina wan

hene, biblo û alavên din ên ku dişibin van û bo xemlandina malê tîn bikaranîn ji bo ku xetereyek ji wan pêk neyê mirov dikare bi materyala zelîqonkî ku dişibe macûnê û wek “macûna erdhejîyê” tê binavkirin bi kar bîne û van alavan bi vî macûnê ve li cihê ku lê ne bizeliqîne.

Raflarda Duran Eşyalar

Alavên ku Di Refikan De Disekin

Raflar üzerinde bulunan her türlü malzeme deprem sırasında risk oluşturabilir. Bunun için, öncelikle üzerinde raf bulunan sistemler yapının uygun olan çeşitli yerlerine sabitlenir. Önerilerine çıta veya kopmaz ip düzeneği yapılır. Ağır kitapların alt raflara konulması önemli bir tedbirdir.

Her cure alavên ku li ser refikan disekinin di kêlîya erdhejîyê de dikarin bibin sedema rîskeke. Ji bo ku ev rîsk pêk neyên jî di serî de ev alavên ku li ser refikan disekinin divê li cihên guncan ên refikan ve bînan zeliqandin û zeximkirin. Li pêşîya wan jî mirov dikare bendekî ku neqete bikişîne an jî darikekê deyne. Bergiriyeke baş û di cih de ye ku mirov pirtûkên giran bixe refên herî jêr.

Yapılarda Kullanılan Camlar ve Cam Eşyalar

Cam û Alavên ku ji Camê Hatine Çêkirin ên ku Di Avahîyan de Tên Bikaranîn



Evimizde kullanmakta olduğumuz cam eşyalar, camlı vitrinler, camlı tablolar, camlı masa ve sehpa, akvaryumlar temperli cam veya pvc benzeri şeffaf malzemeler kullanılabilir. Pencerelerin önüne kalın perde kullanılabilir.


Mirov dikare alavên cam ên ku di malên xwe de bi kar tîne yê wek; camekan, nîgarên bicam, mase û sêpayên ku ji camê hatine çêkirin û masîdankan bi camên temper an jî ji materyalên zelal ên wek pvc bide çêkirin. Her wiha li pêşîya şîbakeyan mirov dikare perdeyên stûr bi kar bîne.



Güvenlik Cam Filmleri

Fîlmên Ewlehîyê yê BiCam

Değiştirilmesi mümkün olmayan camdan yapılmış mobilyaların, boy aynalarının deprem sırasında zarar görmelerini önlemek için güvenlik cam filmleri kullanılabilir. Film, camın iç kısmına uygulanır. Böylece, camların kırıldığında küçük ve keskin parçalara ayrılmasını engelleyecektir.



Alavên ku ji camê hatine çêkirin û guherandina wan ne gengaz be yê wek; mobîlyayên ku ji camê hatine çêkirin, neynika mezin a qamî û hwd. Bo ku di kêliya erdhejîyê de zerarê nebînî mirov dikare ji bo wan fîlmên cam ên ewlehîyê bi kar bîne. Ev fîlm bi hindûrê camê ve tîne lêxistin. Bi vî awayî jî dema ku cam bişike jî ev fîlm dê bibin asteng ku cam ji hev belawela bibe û bi perçeyên biçûk û tûj belavî nava malê bibe.

Aydınlatma Elemanları

Hêmanên Ronîkirinê

Lamba benzeri aydınlatma elemanları genellikle bir deprem sırasında bulunduğu yerden düşerek, çıkarak veya devrilerek kırılır ve bu nedenle maddi hasarlara neden olur. ikincil bir risk olarak bazen yangına, bazı durumlar-da yaralanmalara da yol açar. Belirtilen risk durumları üretim teknolojilerine ve kullanım amaçlarına uygun basit teknik yöntemlerle azaltılabilir.



Hêmanên ronîkirinê yên wek lembeyan bi piranî di kêlîya erdhejîyan de ji cihê ku lê ne dikevin an jî derdikevin û bi awayê qelibandinê ve dişikin û xesareke madî bi xwe re tînin. Wek rîskeke duyemîn jî carinan jî dibin sedema derxistina şewatekê û hin caran jî dibin sedem ku hin kes birîndar bibin. Ev rîskên ku hatine destnîşankirin di çarçoveya armanca hilberîn û bikaranîna wan de bi hin rêbazên hêsan û teknîk dikarin ji holê rabin an jî bên kêmkirin.

Tavanda Asılı Duran Aydınlatmalar

Alavên Ronîkirinê yên Ku Bi Binban ve Daleqandîne



Avizeler kapalı ağızlı kancalarla asılmalıdır. Sarsıntı sırasında kolayca duyardan çıkan floresan ampullerin düşmemesi için kablo bağı gibi basit bir yardımcı malzemenin kullanılabilir.

Awîze divê bi çingolkên devgirtî ve bi binban ve bên daleqandin. Di kêlîya hejîne de floresana ku ji dûyê derkeve bo ku ampûlan jî danexîne mirov dikare wek materyaleke gelek hêsan bi rêya girêkeke kabloyê pêşîya wê asê bike.



Isıtma Sistemleri

Tertîbatên Germkirinê

Isıtma sistemleri yakın çevrelerindeki kolayca tutuşabilecek perde, koltuk, halı gibi eşyalardan uzak tutulmalıdır. Sobalar mümkün olduğu kadar bacaya yakın kurulmalıdır. Soba boruları, kelepçeler yardımıyla duvara sabitlenmelidir. Sobalar esnek metal şeritle duvara sabitlenir.



Tertîbatên germkirinê divê ji alavên ku zûzûka dikarin bişewitin ên mîna; perde, paldank û xalîçeyan bîn dîrxistin. Heta ku ji destê me bê divê em sobeyan nêzî kulekê bi cih bikin. Divê lûleyên sobeyan jî bi alîkariya tewqan ve bi dîwar ve bîn kirin. Her wiha divê sobe jî bi terîşên vezelokî yê metalîn ve bi dîwar ve bîn girêdan.



Tüpler Tûp

Ev tipi tüpleri yere dokuma kayışlar yardımıyla sabitlenmelidir.

Tûpên ku em li malê bi kar tînin divê bi alîkarîya qayîşên caw ve bi erdê ve bîn girêdan.


Dış Mekânlar Cihên Derveyî Malê



Yapısal olmayan riskler, yaşadığımız mekânların dışına, sokağa çıktığımızda da karşımıza çıkar. Binaların dışına yerleştirilmiş tabelalar, klimalar, reklam panoları, dış mekân camları, uydu antenleri, asılı duran çiçekler, kiremitler, bacalar gibi eşyalar sağlam bir şekilde monte edilmediklerinde risk oluşturur.

Rîskên nebinyadî ne tenê di nava malê de rîskê tînin bi xwe re. Dema ku em ji cihê xwe yê jiyînê

derkevin derve û kuçeyan jî ev rîsk dikarin bîn ber me. Wek nimûne; lewheyên ku li derveyî avahîyan ve hatine daleqandin, kulîlkên ji derve ve daleqandî, klîma, panoyên ragihandinê, camên mekanên derve, antênên stalaytan, kulek, qermîten avahiyan heke bi awayekî saxlem nehatibin bicihkirin dikarin bo me rîskekê pêk bînin.



DEPREM SIRASINA YÖNELİK HAZIRLIKLAR AMADEHÎYÊN BO KÊLÎYA ERDHEJÎYÊ

- Ev, işyeri, okul, trafik, açık alan, deniz kenarı gibi farklı ortamlarda depreme yakalanılması halinde yapılacakların belirlenmesi ve tüm aile üyelerince paylaşılması,

Îhtîmal heye ku em li cihên cur bi cur ên wek; mal, dibistan, cihê karî, trafik, derve, ber behrê û hwd. bi erdhejîyê re rû bi rû bimînin. Lewma berî ku em li van cihên cur bi cur li erdhejîyê re rû bi rû bimînin divê em dîyar bikin bê ka em ê çawa tevbigerin û van dîyarkirinan bi hemû endamên malbatê re jî parve bikin.

- Deprem sırasında yapılması tavsiye edilen Çök, Kapan, Tutun uygulaması için evin tüm odalarında en emniyetli yerlerin tespit edilmesi,

Ji bo tevgera ku di kêlîya erdhejîyê de kirina wê tê pêşnîyarkirin û wek “Bikumişe, Xwe Biparêze û Xwe bi Cihekî ve Bigire” tê binavkirin, divê li hemû odayên malê cihên herî ewle bîn destnîşankirin.

- Belirlenen maddelerin genel olarak 6 aylık periyodlar halinde tüm aile üyeleri tarafından tatbikatla uygulanması.

Ev xalên ku hatine destnîşankirin bi gelemperî divê bi perîyodên şeş mehî bi hemû endamên malbatê re bîn ceribandin û tetbîqateke bi vî rengî bê çêkirin.



DEPREM SONRASINA YÖNELİK HAZIRLIKLAR


AMADEHÎYÊN BO PIŞTÎ ERDHEJÎYÊ

- AFAD Acil uygulamasını cep telefonunuza indiriniz.

Sepana mobîl a bi navê “AFAD Acil” daxînin telefona xwe ya mobîl.



- Aynı ya da farklı yerlerde depreme yakalanan aile fertlerinin nerede buluşacakları tüm aile üyelerince paylaşılması önemlidir.



Ji nav endamên malbatê yê ku li heman cihê an jî li cihên cuda bi erdhejîyê re rû bi rû bimîn li ku derê dê bîn li gel hev divê berî erdhejîyê bizanin û bi hev re parve bikin. Ev yek bo ku kêlîya erdhejîyê hemû endamên malbatê bikarin werin gel hev gelekî girîng e.


- Yaşanan depremin ardından belli bir süre için yaşamımızı, oluşturulacak çadır kentlerde sürdürmemiz söz konusu olabilir. Bu duruma hazırlıklı olmak yararlı olacaktır. Halkın toplanması ve çadır kentler oluşturulması amacıyla saptanmış yerleri öğrenmeliyiz.

Piştî ku erdhejî pêk hat şûn ve dibe ku bo demekê em jiyana xwe li bajarokên konî yê ku dê bîn avakirin derbas bikin. Heke em bikarin xwe bo vê rewşê jî amade bikin dê baş bibe. Divê em cihên ku dê gel li hev bicive û bajarokên konî dê lê vebin berî erdhejîyê hîn bibin û biçin van deran bibînin.

- Olası bir afet ve acil durum sonrası aile fertleriyle buluşacağımız toplanma alanlarımızı öğrenmeliyiz. Toplanma alanları afet acil durumlar sonrasında geçici barınma merkezleri hazır olana kadar geçecek süre içinde yaşanacak paniği önlemek ve sağlıklı bilgi alışverişini sağlamak amacıyla halkın tehlikeli bölgeden uzaklaşarak toplanabileceği güvenli alanlardır. Kendi toplanma alanlarınızı ve oraya nasıl ulaşabileceğinizi önceden deneyimleyiniz. Toplanma alanlarını, mahalle muhtarından, komşulardan, belediyeden, e-devletten öğrenebilirsiniz. Sıcak yemek ve battaniye dağıtımı bu noktalarda yapılacaktır.




Piştî bobelat an jî rewşeke lezgînî ku ihtîmala wan heye pêk werin wek endamên malbatê em ê li kîjan qadan li hev bicivin divê berî erdhejîyê em hîn bibin. Ev cihên ku xelk li hev dicive; piştî ku rewşeke lezgînî an jî bobelatak pêk hat şûn ve heta ku navendên demkî yên stirînê ava bibin, bo ku pêşî li ber qurfa gel bê girtin, danûstandineke baş a agahîyan bê kirin û gel ji herêmên xetere bên dûrxistin û di cihekî ewle de bimînin tên bikaranîn. Cihê ku em ê lê bicivin û rêya xwe gihandina wê derê berî erdhejîyê divê hîn bibin û qet nebe carekê biciribînin ku biçin wê derê. Cihên herî



nêzîkî we ya ku di rewşeke wiha de dê gel li hev bicive hûn dikarin ji keyayên taxa xwe, ji ciranên xwe, ji şaredariyê an jî ji ser sepana e-devletê hîn bibin. Betanî û xwarina germ dê li van deran bên belavkirin.

- Belediyeler, afet sonrası için Acil Durum Yolları saptamıştır. Bu yollarda trafik, afet sonrasında normal araçlara kapatılabilir. Bu durumda acil durum yollarını bilmek, araç kullanmamızın gerekli olması halinde alternatif güzergâhları saptamamıza yardımcı olacaktır.

Şaredarî ji bo piştî bobelat û rewşên lezgîn “Rêyên Rewşên Lezgîn” diyar dikin. Lewma jî dibe ku piştî rewşeke lezgîn ev rê ji bo erebeyên sîvîl bên girtin. Ji ber vê yekê jî heke hûn van rêyên rewşên lezgîn hîn bibin û heke hewce bike ku hûn bi erebeyê biçin cihekî ev zanîn dê bi kêrî we bê ku hûn rê û rêgehên alternatîv peyda bikin.



- Depremin ardından hatlar kilitlendiğinden gerekli olmadıkça telefonlar meşgul edilmemelidir. Bu durumda uzakta yaşayan bir tanıdık “irtibat kişisi” olarak saptanmalıdır. Depremin hemen ardından uzaktaki bu kişi aranarak durum kısaca anlatılmalıdır. Hakkımızda bilgi edinmek isteyen yakınlarımız, bu kişiyi arayarak durumumuzu öğrenebilirler. Bu uygulamanın ön koşulu; irtibat kişisinin isim ve numaralarının tüm yakınlarımıza önceden aktarılmasıdır. Bu zamanlarda SMS kanalıyla ulaşmak daha kolay olabilir.

Piştî erdhejiyê ji ber ku xetên telefonan asê dibin heta ku hewce neke telefonan bi kar neyînin û xetan mijûl nekin. Di vê rewşê de nasekî ku li cihekî dûr dijî divê wek “kesê/a peywendîdar” bê diyarkirin. Piştî erdhejiyê yekser divê ji vî/vê kesî/ê re telefon bê kirin û bi kurtasî rewşê bê qalkirin. Nas û dostên me yê din ku dixwazin di der barê me de agahîyê wergirin jî dikarin li vî/vê kesî/kesê bigerin û agahiyan ji wî/wê wergirin. Lê belê şerta bingehîn ya vê kiryarê ew e ku divê ji pêşî ve nav û hejmarên vî/vê kesî/kesa peywendîdar ji hemû nas û dostan re hatibin şandin. Dibe ku di demên wiha de bi rêya SMSê ragihandin û xwe gihandina mirovan hêsantir be.



- Deprem bir afet oluşturmaları halinde 72 saat yardım gelmeyebilir, hazırlıklı olmalı ve su, barınma ve beslenme gibi temel ihtiyaçlarımıza yönelik Afet ve Acil Durum Çantası'nı tüm ailenin bildiği bir yerde hazır bulundurmalyız.

Heke erdhejî bibe sedema bobelatekê, dibe ku di nav 72 saetan de alîkarîyek negihîje we. Lewma jî divê em ji vê rewşê re jî xwe amade bikin û ji bo pêwîstîyên sereke yê wek av, xwarin û vexwarinê “Çenteyê Rewşên Lezgîn û Bobelatan” amade bikin û deynin cihekî ku hemû endamên malbatê cihê wê bizanin û bikarin bi hêsanî wergirin.

- Deprem sonrasında yaşamın normale dönmesi ve maddi hasarın giderilmesi için, DASK (Doğal Afetler Sigorta Kurumu) tarafından düzenlenen Zorunlu Deprem Sigortası yaptırmalyız.



Resim kaynak: <https://www.habereko.com/haber/dask-adres-kodu-nasil-ogrenilir/>

Bo ku piştî erdhejiyê jiyana me careke din normalîze bibe û qet nebe xesara madî bê telafîkirin Sîgortaya Mecbûrî a Erdhejiyê ya ku ji hêla SSBX(Saziya Sigortayên Bobelatên Xwezayî) ango DASKê ve tê çekirin divê em teqez çekin.

Özel Malzemeler

Materyalên Taybet

Bebekler için

Mama, bebek bezi, biberon, ilaçlar, yedek giyecek, Acil Durum Bilgileri Kartı (sahip olduğu rahatsızlıklar, kullanılan ilaçlar, alerjiler, aile iletişim ve adres bilgileri, tüm acil durum bilgileri yer almalı).

Ji bo Pitikan

Gebol, cilikên pitikan, biberon, derman, kincên zêde, Karta Agahîyên Rewşên Lezgîn (Di vê kartê de divê, nexweşîyên ku pê re hene, kîjan dermanan bi kar tîne, alerjîyên wê/wî, agahîyên ragihandinê yên malbata wê/wî û navnîşana wan û her wekî din hemû agahîyên rewşên lezgin hatibin nivîsandin.)



İleri Yaşlılar için

İlaçlar, Acil Durum Bilgileri Kartı (sahip olduğu rahatsızlıklar, alerjiler, ihtiyaç duyulan özel ekipman ve protezler, aile iletişim ve adres bilgileri yer almalı).

Ji Bo Kesên Temen Mezin

Dermanên wî/wê, Karta Agahîyên Rewşên Lezgîn (Di vê kartê de divê, nexweşîyên ku pê re hene, kîjan dermanan bi kar tîne, alerjîyên wê/wî, ekîpman û protezên ku hewce dikin û agahîyên ragihandinê yên malbata wê/wî û navnîşana wan hatibin nivîsandin.)

Engelliler için

İlaçlar, Acil Durum Bilgileri Kartı (fiziksel engeli, sahip olduğu rahatsızlıklar, alerjiler, ihtiyaç duyulan özel ekipman ve protezler ile doktor, aile iletişim ve adres bilgilerini kapsayan, tüm acil durum bilgileri yer almalı).



Ji bo Astengdaran

Derman, Karta Agahîyên Rewşên Lezgîn (Di vê kartê de divê astengîya wî/wê ya fizîkî, nexweşîyên ku pê re hene, alerjîyên wî/wê, ekîpmanên taybet ên ku hewcedarî dê bi wan çêbin, heke hebe agahîyên bijîşkên wî/wê û agahîyên ragihandinê yên malbata wê/wî û navnîşana wan û her wekî din hemû agahîyên rewşên lezgin hatibin nivîsandin.)



Ev hayvanları için

Veteriner bilgileri, aşı kayıtları, ilaçlar, ilk yardım malzemeleri, tasma ve sevk kayışı, ev hayvanınızın güncel bir fotoğrafı.

Ji Bo Heywanên ku Li Malê Tê Xwedîkirin

Agahîyên beytarê/a wan, qeydên wan ên vaksînê, derman, materyalên alikarîya destpêkê yê tibbî, toq û qayîşa kaşkirinê û wêneyê herî nû yê heywanê we.

Özel Koşullar

Şert û Mercên Taybet

Bebekler ve Yeni Yürümeye Başlayan Çocuklar Pitik û Zarokên ku Hê Nû Dest Bi Meşê Dikin

Kırılma, devrilme ya da eşya düşmesi gibi risklerden korunmak amacıyla; beşik ya da bebek yatakları, pencerelerden, sabitlenmemiş yüksek dolap ve raflardan uzağa yerleştirilmelidir.

Dergûş an jî cihên ku zarok lê radikevin; ji bo ku ji rîskên mîna bi ser wan de şikestin, qelibandin û ketina alavan bên parastin divê ji şibakeyan, ji dolabên bilind ên ku bi cihekî ve nehatine zeximkirin û ji refên dolaban dûr bên dayîn.



Deprem sonrası hızlı tahliye ihtiyacının belirmesi olasılığına karşı, bebek arabası gibi malzemelerin her an için kolay ulaşılabilir bir noktada saklanması önerilmektedir.

Piştî erdhejiyê dibe ku bi lez û bez hewce bike ku mal bê texlîyekirin. Lewma jî li gel vê dibetîyê divê malzemeyên wek erebeyên zarokan, li cihekî ku her kêlî mirov dikare xwe bigihîne û bi hêsanî derxîne bên danîn.



Kitap, bardak gibi malzemelerin düşmesi, dökülmesi, bebekler için yaşamsal tehdit oluşturabilir. Bu nedenle tüm kapaklı dolaplarda kilitli kulp ya da açık kitap raflarının önünde gergi ipi kullanılması gerekmektedir.

Ketin, şikestin û rijandina materyalên wek pirtûk û îskanan bo pitikan xetereyên jiyânî dikare bi xwe re bîne. Ji ber vê yekê tê pêşniyarkirin ku di hemû dolabên ku bi devik in de çimbilên bimifte an jî di refên vekirî yên pirtûkan de jî benikê vezilî bê bikaranîn.

Okul Öncesi ve Okul Çağı Çocukları Zarokên Pêşdibistanê û Yên Ku Di Temenê Dibistanê De Ne

Yaklaşık üç yaşına gelmiş bir çocuk, depremin ne olduğunu ve neler yapılması gerektiğini anlayabilir. Çocukların yapılacak uygulamaları unutmamaları ve tehlikeye karşı refleks oluşturabilmeleri için tatbikatların yaklaşık altı ayda bir tekrar edilmesi gerekmektedir.

Zarokekî ku kê m zêde hatibe sê salîya xwe dikare fêm bike û tê bigihîje ku erdhejî çi ye û divê di erdhejîyê de çi bike. Ji bo ku zarok ji bîr nekin bê di kêliya erdhejîyê de dê çi bikin û bikarin li hemberî xetereyan bertekan nîşan bidin divê kê m zêde di navbera şeş mehan carekê de tetbîqat bîn çêkirin.

- Çocuklara evin her odasındaki emniyetli yerler gösterilmelidir.
- Çök, Kapan, Tutun hareketi, tespit edilen emniyetli yerlerde çocuklara uygulamalı olarak gösterilmelidir.
- Çocuklara farklı mekânlarda yaşanabilecek depremlerde ne şekilde davranmaları gerektiği öğretilmelidir.
- Üzerinde çocuğun adı, soyadı, adresi, acil bir durum iletişim bilgileri ve eğer varsa sağlık problemleri yazılı acil durum kartları hazırlanmalıdır. Bu kartlar çocukların üzerinde bulunmalı ve güncellenmelidir.



- Divê ji bo zarokan li her odeya malê cihên ewle bên nîşandan.
- Divê tevgera ku wek “Bikumişe, Xwe Bistirê û Xwe bi Cihêkî ve Bigire” li cihên ewle yên ku tèn diyarkirin bi awayekî tetbîqî ji zarokan re bê nîşandan.
- Divê ji zarokan re bê fêrkirin ku dema li cihên cuda erdhejî pêk werin divê çawa tevbigerin û çi bikin an jî çi nekin.
- Divê ji bo zarokan kartên rewşên lezgîn ên ku li serê nav, paşnav, navnîşan, agahîyên rewşên lezgîn û heke hebe pirsgirêkên tenduristî hatine nivîsandin bên amadekirin. Ev kart divê tim li ser zarokan bin û heke agahî biguherîn jî divê ev agahî bên nûkirin.

Yaşlılar

Kal û Pîr

- Yaşlılara, evin her odasındaki emniyetli yerler gösterilmelidir.
- Çök, Kapan, Tutun hareketi, tespit edilen emniyetli yerlerde yaşlılara uygulamalı olarak gösterilmelidir.
- Oksijen tüpü gibi yaşam destek sistemleri duvara sabitlenmelidir.
- Acil Durum Bilgileri Kartı'nı sürekli olarak yanında bulundurmalıdır (sahip olduğu rahatsızlıklar, kullandığı ilaçlar, alerjiler, ihtiyaç duyduğu özel ekipman ve protezler, doktor, aile iletişim ve adres bilgileri vb.).
- Yaşlıların her an için sesini duyurması mümkün olmayabilir. Bu nedenle giysi cebinde veya yakınında bir yerde düdük bulundurması önerilir.
- Özellikle yalnız yaşayan yaşlılar için önemli bir konu, acil durumlarda güvenilebilir desteğe sahip olmalarıdır. Bu durumda; deprem sonrasında onları kontrol edecek, güvendikleri en az iki kişi tespit edilmelidir.



- Divê ji bo kal û pîran li her odeya malê cihên ewle bên nîşandan.
- Divê tevgera ku wek “Bikumişe, Xwe Bistrîne û Xwe Bigire” li cihên ewle yên ku tèn diyarkirin bi awayekî tetbîqî ji kal û pîran re bê nîşandan.

- Divê tevgera ku wek “Bikumişe, Xwe Bistrîne û Xwe Bigire” li cihên ewle yên ku tên diyarkirin bi awayekî tetbîqî ji kal û pîran re bê nîşandan.
- Divê sazûmanên ku bo jiyana wan girîng in ên mîna tûpên oksîjênê bi dîwar ve bîn zeximkirin.
- Divê Kartên Agahîyên Rewşên Lezgîn her tim li gel xwe bihêlin. (Di vê kartê de divê, nexweşîyên ku pê re hene, kîjan dermanan bi kar tîne, alerjîyên wê/wî, ekîpman û protezên ku hewce dikin û agahîyên ragihandinê yên malbata wê/wî û navnîşana wan hatibin nivîsandin.)
- Pêkan e ku kal û pir her kêlî nikaribin dengê xwe bigihînin kesên din. Lewma jî tê pêşniyarkirin ku di berîka wan a kincan de an jî li cihekî nêzîkî wan pîpîkek bê dayîn.
- Bi taybetî ji bo kal û pîrên ku tenê dijîn mijareke girîng ew e ku; di rewşeke lezgîn de piştgiriyeke wan a ewle hebe. Di vê çarçoveyê de, divê herî kêma du kesên ewle bîn tespîtkirin ku bikarin piştî erdhejîyê biçin wan kontrol bikin.

Fizîksel Engelliler Astengdarên Fîzîkî

- Engelli Kimlik Kartı'nın bir kopyasını yanınızda, bir kopyasını da Afet ve Acil Durum Çantası'na koyun.
- Acil Durum Bilgileri Kartı hazırlayın. (Fiziksel engeli, sahip olduğu rahatsızlıklar, kullanılan ilaçlar, alerjiler, ihtiyaç duyulan özel ekipman ve protezler, aile iletişim ve adres bilgilerini kapsamalı.)
- Evde, her odada bulunan emniyetli yerleri belirleyin. Farklı mekânlarda uygulayacakları davranış şekillerini uygulamalı olarak tatbik edin.
- Afet ve Acil Durum Çantası'na kullanılan özel ilaçları ekleyin.
- Yatağının yanında ve varsa tekerlekli sandalyesinin arkasında yedek bir Afet ve Acil Durum Çantası bulundurun.
- Protez, yürüyüş destek malzemesi kullanıyorsa bunları her an için yakınında bulundurmalıdır.
- Giysi cebinde bir düdük bulundurmalıdır.
- Yalnız yaşayan fiziksel engelliler için bir deprem sonrasında sizi kontrol edecek, güvendiğiniz iki kişiyi tespit edin.



- Kopîyeke sûretê Karta Nasnameya Astengdarîyê li gel xwe bihêlin, kopîyekê jî bixin nav Çenteyê Bobelat û Rewşên Lezgîn.
- Karta Agahîyên Rewşên Lezgîn amade bikin. Di vê kartê de divê astengîya wî/wê ya fîzîkî, nexweşîyên ku pê re hene, alerjîyên wî/wê, ekîpmanên taybet ên ku hewcedarî dê bi wan çêbin, heke hebe agahîyên bijîşkên wî/wê û agahîyên ragihandinê yên malbata wê/wî û navnîşana wan û her wekî din hemû agahîyên rewşên lezgin hatibin nivîsandin.)

- Li malê, li her odayê cihên ku ewle ne dîyar bikin. Şiklên tevgerên ku dê li cihên cuda cuda pêk bînin bi awayekî tetbîqatî nîşanî wan bidin.
- Dermanên taybet ên ku bi kar tînin tevî çenteyê wan a Rewşên Lezgîn û Bobelatan bikin.
- Li kêleka cihê ku lê radikevin û heke hebe li pişt kursiyê wan a biteker çenteyekî zêde yê Rewşên Lezgîn û Bobelatan deynin.
- Heke protez û materyalên ku bo birêveçûnê bi kar tînin hebin divê ev her tim nêzîkî wan bin û bi hêsanî bikarin xwe bigihînin wan.
- Divê di berîka kincên wan de pîpîkek hebe.
- Ji bo astengdarên fîzîkî yên ku tenê dijîn divê herî kê du kes hebin ku piştî erdhejiyê bikarin werin wan kontrol bikin. Lewma berî erdhejiyê ev du kes divê bîn diyarkirin.

Ev Hayvanî Sahipleri Xwediyê Heywanên Malê

- Ev hayvanlariinin ihtiyaçlariini; ilaç, aşî, veteriner kayitlari ve kimlik gibi malzemelerini Afet ve Acil Durum Çantasi'na eklemeliyiz.
- Ev hayvanini evimizin içinde belli bir yerde bulunduruyor olmamız halinde (kuş kafesi gibi), bu yerin üzerine bir şey devrilmeyeceğinden emin olmalıyız.
- Kedi ve köpeklerin temel kimlik bilgisini tasma üzerinde, kuşlariinkini ise ayak bileklerinde bulundurun.
- Ev hayvanının güncel bir fotoğrafını tasma ve sevk kayışını Afet ve Acil Durum Çantasi'nda bulundurun.



- Divê pêwîstiyên heywanên ku li malê tîn xwedîkirin wek; derman, qeydên wan ên beytaran, nasnameyên wan û her wekî din materyalên hewcedar tevî Çenteyê Rewşên Lezgîn û Bobelatan bîn kirin.
- Heke heywanê ku em li malê xwedî dikin li cihêkî diyar û sabît be (wek nimûne qefesa çûkan) divê em teqez jê bawer bin ku di kêliya erdhejiyê de dê tiştek bi ser de neqelibe.
- Agahiyên sereke yên nasnameya pisîk û kuçikan li ser toqên wan û yên çûkan jî li ser qevdika pêyên wan ve bikin.
- Bila di Çenteyê Rewşên Lezgîn û Bobelatan de wêneyekî nûjen yê heywanê we, toqê wê û qayîşa kaşkirina wê hebe.

Güvenli İçme Suyu

Ava Vexwarinê ya Paqij


Güvenli içme suyunun eksikliği öldürücü olabilir. 36 saatten fazla su almayan kişiler; susuzluğun etkilerini hissedeceklerdir. Bu nedenle bireylerin temiz içecek suyu buldurmalarında büyük yarar olacaktır.

Kêmasîya aveke paqij ya vexwarinê dikare bibe sedema mirinê. Kesên ku ji 36 saetan zêdetir avê venexwin dê bandora tîbûnê hîs bikin. Ji ber vê yekê jî dê gelek baş û sûdewar be ku her kes aveke paqij a vexwarinê jî li gel xwe bihêle.




Acil Durum Aydınlatması

Di Rewşên Lezgîn De Ronîkirin



Ev için pille çalışan fener. Kişisel kullanım için el feneri. Işıldak lambalar. Kimyasal ışık çubukları. Taşınabilir jeneratörler.

Ji bo malê lembeyên ku bi pîlan dixebitin. Ji bo bikaranîna takekesî lembeyên bidest. Lembeyên ronîker. Şivên kîmyevî yên ronîkirinê. Jeneratorên ku mirov dikare hilgire.



Acil Durum Haberleşmesi

Di Rewşên Lezgîn de Ragihandin

Büyük bir afetten sonra, normal zamandaki haberleşme kanallarınızdan birçoğu devre dışı kalacaktır. Bir depremin hemen ardından muhtemelen telefonlarımız çalışmayacaktır. Bu sorunun çözümü; bulunduğumuz yerden uzakta bir irtibat kişisi belirlemektir. Bu yöntemle; tüm akraba ve arkadaşlarınız, sizinle ilgili olarak bilgi almak için sizi değil, bu kişiyi arayacaklardır.



Piştî bobelateke mezin, gelek xetên me yên ragihandinê ku di demên asayî de em bi kar tînin dê betal bibin. Piştî erdehejiyekê bi îhtîmaleke mezin dê yekser telefonên we nexebitin.

Çareserîya vê pirsgirêkê ev e ku; divê em kesekî/eke ku li cihekî ji me dûr dijî wek kesê/a peywendîdar diyar bikin. Bi vê rêbazê; hemû xizm û hevalên we bo ku der barê we de agahîyan wergirin dê telefonî we nekin û dê telefonî wî/wê kesî/ê ku hatiye dîyarkirin bikin.



**DEPREM SIRASI
DI KÊLÎYA ERDHEJÎYÊ DE**

Bir depremin ne zaman gerçekleşeceğini bilemediğimiz gibi, depreme nerede yakalanacağımızı da bilemeyiz. Evde, işyerinde, okulda, yolda ya da farklı yerlerde depremi yaşamamız söz konusu olabilir. Bu bölümümüz, farklı yerlerdeki temel davranış biçimlerini kapsamaktadır ve her bir yer için özel koşullar ayrıca belirtilmektedir.

Çawa ku em nizanin dê erdhejîyek kengî pêk were em wisa nizanin ku em ê li ku derê û çawa bi erdhejîyekê re rû bi rû bimînin jî. Pêkan e ku em li malê, li cihê karî, li dibistanê, di rê de an jî li cihekî din bi erdhejîyekê re rû bi rû bimînin. Di vê beşê de em ê cih bidin teşeyên tevgerên sereke yên li cihên cuda cuda û ji bilî agahîyên sereke ji bo her devereke em ê şert û mercên taybet jî dîyar bikin.

GENEL TUTUM

HELWESTA GIŞTÎ

Deprem sırasında yapmamız gereken ilk şey olabildiğince sakin kalmak, diğerlerinin de sakin kalmalarına yardımcı olmak, kesinlikle panik yapmamaktır. Deprem öncesinde

yapılacak tatbikatlar ve çalışmalar sakin kalmamızı, aynı zamanda hızlı ve doğru kararlar vermemizi sağlayacaktır.

Di kêliya erdhejîyê de tişta ku herî pêşî divê em bikin ew e ku; divê em sekan bimînin û alîkarîyê bidin kesên derdora xwe ku ew jî bikarin sekan bimînin. Her wiha divê em qet panîkê çênekin. Xebat û tetbîqatên ku berî erdhejîyê em bikarin çêkin, bi saya wan em ê bikarin di kêliya erdhejîyê de sekan bimînin û di heman kêliyê de biryarên lez û dirûst bidin.



GENEL DAVRANIŞ

TEVGERÊN GIŞTÎ

Çök, Kapan, Tutun hareketidir. Her artçı depremde de çök kapan tutun pozisyonunu almayı ihmal etmeyin.

Tevgera “Bikumişe, Xwe Bistirîne û Xwe Bigire” ye. Di her erdhejîya paşhatî de jî divê em pozîsyon û tevgera “Bikumişe, Xwe Bistirîne û Xwe Bigire” ji bîr nekin û îhmal nekin.



Çök

Bireylerin deprem olduğunu anladıkları zaman hızla emniyetli bir yerde yatmaları ya da çökmeleri önerilmektedir. Yatma; yere yüzüstü yatma ya da yan yatarak bacakları karına çekme (cenin) şeklindedir. Çök; özellikle masa altı gibi yerlerin tercih edildiği hallerde uygulanır. İki diz üzerine çökülerek vücut öne eğilir.

Bikumişe

